

## Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî

**DEZGEHA** Xêrxwaziya Barzanî ji bo harîkariya bo hewcedar û mexdûrên şerî li Sûrî ji aliyê Komelaya Aşitî a Zeytûnî a Sûrî ve hat xelatkirin

RÛPEL 09



## Kedkarêkê cuwenê kirmanckî: J. Îhsan Espar

**EKE** kirmanckî şewa zulmate ya vizêrî ra resaya roşnaya ewroyî naye de rolê xoverdayîşê çend şexsîyatan o ke mabênê serranê 1970 û 1980an de ciwanîya xo vîyarnaya pîl o.

RÛPEL 11



## Sê çîrokên Stenbolê-II

**DÊ** li Stenbolê erdhejeke mezin bibe. Zanyar radigihînin ku erdheja 1999an çiqas tesîra xwe lê kiribe jî, di rastiya xwe de Stenbol ne navend bû.

RÛPEL 13

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 14
10 - 16 NÎSAN 2017
www.basnews.com




S2

PIŞTÎ ESAD;

# LI SÛRÎ JI KURDAN RE ASOYEKE NÛ

**> PENTAGÔNÊ AMAJE KIR**

Beriya êrişê me Rûsia agahdar ku hevpeyvmanê Sûrî ye. Ev êriş ji ber bikaranîna çekên Kîmyewî hat kirin. Li hember vê amajeyê jî Sûrî da xwiyakirin ku wan baregehên hewayî a Şaryatê vala kir.

**> HEVSEROKÊ PYD SALİH MÛSLİM**

Ji ber atmosfera rû da DYA, neçar ma ku li hêzên leşkerî yên Sûriyê bixe. Ji ber ku ewên ji çareseriya siyasî bawer nekin wê werin ser riya rast û wê têbigihêjin ku berdewamiya şer tu encamê nade.



**HOŞENG OSÊ** >04

Tevgera Apociyan û rêjîma Esad: Evîna ji aliyekî - II



**EKREM ÖNEN** >05

Kerkûk: Osmanî, Înglîz, Ereb û Kurd



**FIRAT CEWERÎ** >07

Edebiyata modern û ferdiyet

S3 PROFESOR XELÎL SMAÎL:



## Demografiya Kerkûkê hat guhertin

Piştî îlankirina Îraqê Melik Feysel dest bi guhertina Herêmên Kurdî kir. Xwest bi demografya Kerkûk,Hewîce û deverên Kurdî biguherîne û rêjeya hejmara şêniyên Kurd li deverê kêm bike.


S6 HASAN RÛHANÎ



## Kurdan tenê ji bo dengdanê dixwaze

Wî, kabîneya xwe weke raman û hêvî binav kiriye. Lê wisa xuya ye ku ramanên wan tenê ji bo darvekirin û girtinê bikar tên. Ji bilî darvekirin û girtina Kurda tu projeyên wan nîn in.

S8 ŞEFÎQ PÊŞENG:



## Kerkûk, referandom û meşrûiyet

Başûrê Kurdistanê piştî hilweşandina rejîma Seddam û bi qanûna bingehîn ya 2005an dibûn xwediyê statûyeke fermî ya him ji aliyê dewleta Iraqê û him ji aliyê sazî û dezgehên navneteweyan naskirî.



MURAD CÎWAN

## Însanê pirziman, miletê pirziman

Ji mêj ve difikirim; hebûna însanê/a pirziman qebûl dike, lê fikra miletê pirziman qet nayê hişê me û em serê xwe li ser fenomeneke wiha naêşînin. Gelo wek insanê/a pirziman, nikare miletê pirziman ji hebe?

Hemû milet ne xwediyê take zimanekî ne. Beşek ji wan; ne tenê hin takekes an tebeqeyên wan, seranser civak pirzimanî ne.

Pirzimaniya ku li vir tê behs kirin, ne ya ku dewletek ji yekî bêhtir zimanên resmî di nav xwe de qebûl dike. Gelek dewlet hene ku xwedan du-sê, heta zêdetir zimanên resmî ne, lê civakên wan, hemû an hin ji wan yekzimanî ne. Li Kanadayê ku du zimanên resmî (îngilîzî û fransî) hene, tenê %13ê civakê herdu zimanan dizanin, %87ê xelk yan tenê îngilîzî, yan tenê fransî dizanin. Tevî hebûna du zimanên resmî, zehmet e ku meriv ji civakên kanadî re bêje yên duzimanî.

Lê li Tanzaniyayê %90ê seranserê civakan, xwedan du zimanan, an zêdetir in.

Pêwendiya pirzimaniya civakê raste rast bi qebûl kirina ji yekî bêhtir zimanên resmî tune ye. Hetta pirrê caran, di tarîxê de, ferz kirina takezimanê resmî ji ba dewletekê ve, serdestîya li gel êş, azar û texrîbata asîmîle kirina civakên cuda, di armancên xwe de biserneketine, lê bûne sedemê pirzimaniya civakên armanc kirî.

Zimanên dîn ên cîhanşimûlî (latînî, erebî, îbranî, sanskrîtî hwd), yan jî ên xanedaniyên ku piştre bûne împaratoriyek a ji gelek civakan pêkhatî (rûsî, fransî, almanî, tirkî, farisî, çînî hwd) bêyî ku qesd bikin rê li pirzimaniya civakan vekirine. Împaratoriyên ku bi sedan sal li ser ruyê erdê welat dagir kirin, kolonî avakirin jî, bi awayekî bêedaletiya tarîxî yan wek hêzeke mezin a cîhanşimûlî ya siyasî, eskerî, teknolojî-aborî, zanistî û kulturî rol di peyda bûna pirzimaniyê de lîst. Înilîzî, fransî, rûsî û hin zimanên dîn ên ewropî bi vî awayî li Asya, Afrîqa û Ewropaya Rojhilat bûne sedemên pirzimaniya civakan. Amerîkanî îro xwedan roleke wiha ye.

Li vê derê behsa me ya esasî ne sepandina hin zimanan bi ser hin civakan de ya bi darê zorê, an qebûl kirina ji bal civakan ve ji ber hêzdarî û avantajên xwediyên wan e. Ya ku ev nivîs li serê radiweste, bi çi sedemî dibe bila bibe, peydabûna pirzimaniya di civakan de ye. Li gor lêkolînên zanistî, hebûna civakên pirzimanî li ser ruyê erdê, ji yên civakên yek zimanî gelek bêhtir in, tevî ku yek zimaniya civakan wek normeke seranserî cîhanê di mêjiyan de bi cih buye. Ev îmajeke gelek şaş e. Ji xwe bi lêkolîneke gelek sivik, rastî kare bêditin; li ser ruyê erdê, behsa 6-8 hezar zimanan tê kirin, lê li dor 200 dewletan hene. Gava wek hev bê parvekirin, serê her dewletekê dike 30-40 ziman ku çendek ji wan ji ba civakên cuda yên li nav van tên bikaranîn.

Yek ji ber bi çavtirîn nimûneyên civakên pirzimanî, miletê Kurd bixwe ye. 'Cîlweya tarîxê' û 'qedera' vî miletî wiha kiriye ku carinan bi xweşî, pirranî jî di encama çespandineke bi darê zorê, Kurd bûne miletekî pirzimanî. Hebûna Kurdan di nav dewleta Sasaniyan de, bi hatina îslamiyeta erebî ziman, misilman bûna wan, îstîlayên tirkan ji Asyaya Navîn û avakirina dewletan li ser wan erdan ku Kurd jî li sere ne, piştre peydabûna du împaratoriyên mezin; Osmanî û Îranî ku Kurdistan di nav wan de parçe bû, di destpêka sedsala bîstê de avakirina dewletên ereb, faris û tirk yanî di midetê bi sedan salan de welê kir ku di destpêkê de elît; arîstokrat û tebeqeyên ilm, îrfan, huner û rêberênidarî-siyasî yên Kurdan, pişt re jî di dema me de, miletê Kurd buye pirzimanî. Tevî ku civakên serdest bi xwe (tirk, faris, ereb) yekzimanî ne, Kurd li her perçeyan bi kêmasî du (Kurdî-tirkî, Kurdî-erebî, Kurdî-farisî), têgihiştî û elîtên civaka Kurdan ên warên cuda sê-çar zimanî ne.

Helbet bi vê tesbîtê, qesda min ne ew e ku serdestîya miletên farisî, tirkî û erebiaxêv, siyaseta wan a asîmîlekirinê tu pirsgirêk ji ziman, kultur, jiyana ilmî ya civaka me re neanîne. Bileks, heta van salên nêzîk jî ji ber asîmîle kirinê, ziman û hebûna miletê Kurd hat ber tune bûnê. Her çendî li berxwedana Kurdan ev siyaseta bêyom pûçkir jî, ev nirxê hêja hê jî di nav xeterên mezin de ye. Lazim e bi her awayî Kurd xwedî li ziman û kultura xwe derkevin, derfetên wê yên pêşketinê firehtir bikin.

Lê nabe ku em nebînin, ji ber ku me vê pirzimaniya xwe nedîtiye, bi sedan sal in ku wek miletekî ser ruyê erdê, me para xizmeta xwe ya di avakirina ilm, îrfan û medeniyeta cîhanşimûlî de jî înkar kiriye, em xwedî lê dernektine. Bi kêmasî ji derketina îslamê bi vir de, bi hezaran zana, edîb, hunermend û her awe ronakbîrên me derketine. Bes ji bo ku bi erebî, farisî an tirkî nivîsîne, me ew red kirine, ked û berhemên wan ên hêja bi avê de berdane û ew xizmetkarê miletên din nîşan dane. Di miletên din de jî gelek dewrên wiha hene ku entelektuelên wan bi zimanên din nivîsîne, lê wan ew red nekirine, xwedî li wan derketine û keda wan ji xwe hejmartine.

Êdî roj hatiye ku Kurd jî vê meselê ji nuh ve binirxînin û xwedî li tarixa xwe ya ilm, îrfan û hunerê derkevin, îtîbara entelektuelên xwe yên bi sedan salan xizmetên hêja kirî li wan vegerînin û bi wan serbilind bin.

# Piştî Esad; Ji bo Kurdan asoyeke nû



Pentagonê amaje kir ku beriya êrişa fûzeyî bê kirin Rusya –ku mûteffîkê Suriyê ye- hatibû agahdar kirin. Li hember vê amajeyê rejîmê jî amaje kir ku wan Baregeha Hewayê a Şayratê berî êrişê vala kiribûn û lewma tu eskerê wan ne li wê derê bû.



DERYA KILIÇ

**HÊZÊN** rejîmê wan rojên hanê êrişek birin ser Îdlîba Suriyê û îddîa ew e ku di êrişê de çekên kîmyewî bi kar anîne. Di derbar êrişa ku tê de piraniya wan zarokên sîvîl mirin de, rejima Suriyê anî ziman ku çekên kîmyewî bi kar neanîne. Hê nîqaşên di derheq çekên kîmyewî de didomiyan ABD di 7 nîsanê de bi fûzeyan li Baregeha Hewayê a Şayratê xist. Waliyê Humus a ku bi Suriyê ve girêdayî ye paşê ragihand ku di êrişê de 5 kes mirine û 7 jî birîndar in. Serokê Dewlata Surî Beşar Esad di derheq vê êrişê de got; "Ev, kiryareke bûdalene û had-nezaniyê ye. Vê kiryarê hişt ku em li hember rêxistinên terorî têkoşîna xwe bidomînin û ew her li ku dibin bila be em wan tune bikin û xwe ji wan hêzên terorîst xilas bikin."

**Nîqaşên ku piştî êrişê...**

Hê di germagerma êrişê de, li pey hev pêşketinên nû rû dan. Pentagonê amaje kir ku beriya êrişa fûzeyî bê kirin Rusya –ku mûteffîkê Suriyê ye- hatibû agahdar kirin. Li hember vê amajeyê rejîmê jî amaje kir ku wan Baregeha Hewayê a Şayratê berî êrişê vala kiribûn û lowma tu eskerê wan ne li wê derê bû.

Nîqaşeke din jî ew bû ku bê ka rejîmê çeka kîmyewî bikar anîbû an na. Rejîmê berê dabû zanîn ku wan, li sala 2014an çekên kîmyewî yên di dest xwe de ji dest xwe derxistine lê Rusya li dijî vê derketibû. Û bi ser de Rusyayê ev êrişa ABDyê şibandibû ya Iraqê. Çima ku destûr ji Yekîtîya Ewrûpa (YE) nexwestiye ev kiryara ABDyê wek dij-hiqûqî nirxand.

**Di derheq êrişê de kê çi got?**

Piştî êrişê, Îsraîl, Erebistana Suudiyan, Fransa, Britanya, Japonya, Türkiye, NATO û Yekitiya Ewrupa (YA) piştgirî dane ABDyê lê Rusya û Îranê ev rexne kirin.

Berdevkê Qesra Spî, Sean Spicer, êrişa hewayî ya ABDyê wek gaveke somut a li hember êrişa Îdlîpê dît û wiha nirxand; "Gava ku hate avêtin teqez li hember rejima Esad bû. Ez di wê baweriyê de me ku me duh êvarî peyameke zelal da." Û lê zêde kir ku li Suriyê pêşengî ne ya rejîmguhertinê ye.

Alîkarê Serokwezîrê Tirkiyê Numan Kurtulmuş got, "Tiştekî erênî û maqûl e ku li wê baregeha eskerî xistin. Hêviya me ew e ku ev operasyon bibe sedema aştiyê jî"

Berdevkê Karên Derwe yê Îranê Behram Kasımi jî amajeyeke wiha kir: "Îran çalakiyên yek-alî yên mîna vê şermezar dike. Ev çalakî rê li ber vedike ku li Surîye terorîst xurt bibin. Ewê rewşê li Suriyê dijwartir bike."

Di derbarê êrişan de amajeya herî hişk ji Rusya hat. Serşêwirmendê Putîn, Dimitry Peskov; "Serokê Dewletê Putin, vê êrişa ABDyê wekî ku li hember endamekî Milletên Yekbûyî hatibe kirin, dibîne û wer dinirxîne ku ev li zagonên navneteweyî nake. Putîn di wê baweriyê de ye ku, ABD dixwaze bi vê êrişê miriyên sîvîl ên li Iraqê ji ber çavên raya giştî a dinyayê dûr bixe."

Rusyayê, protokola ku wan û ABD di nava xwe de îmze kiribûn ji holê rakir. Protokol li ser ewlehiya teyareyên her du aliyên ku dikevin sahaya hewayî ya Suriyeyê bû. Her wiha Moskowayê Yekîtîya Miletan (MY) jî demildest gazî civînê kir.

**Ji Salih Mûslim piştgiriya ABD**

Hevserokê PYD Salih Mûslim jî amaje kir ku piştgiriyê didin êrişa ABD a li hember Suriyê û wiha anî ziman; "Ji ber atmosfera hatî afirandin ABD, neçar ma ku li hêzên eskerî yên Suriyê bixe. Ji ber ku ewên ji çareseriya siyasî bawer nekin wê werin ser riya rast û wê têbigihêjin ku berdewamiya şer tu encamê nade. Amerika rasterast di nava meseleyê de ye û nikare bêdeng bimîne."

**"Li Suriyê pêvajoyeke nû dest pê dike"**

Kawa Azîziyê endamê ENKS, derbarê êrişê de got "Ev peyama ABD tê wateya 'li Suriyê çareseriyeke bêyî Esad.' Li Suriyê pêvajoyeke nû dest pê dike. Rola Rusya, Îran û PYD a heta îro li wir qediya. Trump, bi vê êrişê xêzeke sor kişand û dest danî ser meseleyê." Û wiha lê zêde kir; "Li Suriyê yekane çareserî sîstemeke federal e. Serok Mesûd Barzanî ev riya çareseriyê berê ji ABD re pêşniyar kiribû."

**"Nexşeya herêmê wê biguhere"**

Pîsporê Têkiliyên Navneteweyî Sersam Şiwanî, li ser êrişa ABD û bandora wê ya li Kurdan wiha axivî; Ji îro û pê ve guherînên heremî wê ji her car lezgîntir biqewimin. ABD, nahêle ku hîvika Şîî pir pêş de here. Jixwe Trump jî him berî hilbijartinê him piştî hilbijartinê dabû zanîn ku hewce ye sînorek li pêşiya pêşdeçûyina Îranê bê danîn. Trump di wê fikrê de ku li herêmê ew ê guhertinên mezin çê bibin, piştî ku Daîş qediya ABD difikire ku li herêmê polîtîkayeke ji ya Rusya xweser bişopîne. Trump, wê nexşeya herêmê biguhere. Di vê nexşeyeê de Kurd jî wê bigihêjin heqên xwe. Bes hewce ye Kurdên Suriyê hemû têkiliyên xwe bi Îranê re bibirrin û wek Hikûmeta Kurdîstanê têkiliyên xwe bi tirkiyê re pêş bixin. Piştî ku Başûrê Kurdîstanê xweserî îlan kir ewê Kurdên Suriyê jî bêhtir xwe nêzikî Başûr bikin.

**"Hewce ye meselaya çekên kîmyewî bê zelal kirin"**

Rojnamevan Mustafa Kemal Erdemol; "Berî her tiştî divê bê zelal kirin bê ka çekên kîmyewî hatin bikaranîn an na. Suriye di 2014 an de li ber çavên hemû dinyayê daxuyanî da ku di bin çavdêriya MY de hemû malzemeyên ku bi kêrî çêkirina çekên kîmyewî tên ji dest xwe derxistine." Erdemol wiha domand; "Ev ji hêla herkesî ve hatibû qebûl kirin. Di dest rejima Suriyê de çekên kîmyewî tunebûn. Esadê ku dema desthilatdariya xwe hildiweşiya ev çek bi kar neanîn, çima di demeke din ku serkeftinên eskerî û dîplomatîk bi dest dixe de bi kar bîne? Esad, bêyî destûr û desteka Rusya çekên kîmyewî bi kar nayîne."

**"ABD û Rusya li ser Suriye nakevin wê pozisyona şer"**

Ji Zanîngeha Ahi Evran Doç. Dr. Serhat Erkmen jî di wê baweriyê de ye ku êrişa ABD a li hember Suriye ne tiştekî biçûk e lê hê jê re zû ye ku meriv bibêje ABD ji bo rejîma Suriyê hilweşîne dest bi pêvajoyeke nû kiriye.

Erkmen, li ser amajeyên ABD û bertekên Rusya dibêje; bi vê êrişê kirin ku bertekên li hember êrişa Îdlîpê kêm bikin.

Erkmen, axaftina xwe wiha bi dawî kir; "Heke ji tansîyon-daxistinê mebest jibîrkirina hemû tiştî be, ev wiha zû bi zû nabe. Bes ABD û Rusya li ser Suriyê nakevin wê pozisyona şer. Hevdîtina wezaretên derve yên ABD û Rusya hene. Rûdanên piştî vê ewê ji van hevdîtînan derkevin. Ji ber ku li ser Suriyê zafîyetên ABD jî û yên Rusya jî hene."



## Profesor Xelîl Smaîl:


# Kerkûk tu carî nebûye bajarekî Îraqê

DIYAR EZÎZ



## PROFESOR XELÎL SMAÎL:

Meclîsa Bajarê Kerkûkê pêşnûmeya ji bo Alaya Kurdistanê li saziyên fermî were hilgirtin, pesend kir. Biryara Meslîsê di dilê Kurda de rastî kêfxweşiyekê hat. Herwiha Bilindkirina Ala Kurdistanê û Biryara Referandomê rastî bertekên cûda jî hatin. Di vê çarçoveyê de me bi Profesorê Erdnîgarî û Demografî yê Zaningeha Selahaddînê Brêz Xelîl Smaîl re hevpeyvînek kir. Profesor Smaîl berisva pirsên ; Dîroka Kerkûkê, Şêniyên Bajêr di kîjan dîrokê de hatine bajêr û çawa bicîh bûne, Kerkûk a kî ye me da. Profesor Xelîl; Kerkûk di dîroka xwe de her tim Kurd bû. Ji demên Selçûkî heta demên Osmanî Kerkûk herdem xwedî dewlemendiya xwe ya Jeopolîtik bû û tim Bajarekî Kurdistanî bû.



**KERKÛK** di dîroka Kurdistanê de tu carî nebûye bajarekî Îraqî.

Him erdnigarî him jî di dîroka ku jê re dewleta Îraqê tê gotin de mirov dikare herêmê bike sê beş. Herêma yekem; Herêma nîvî ye (Sewad) ku wek Îraqa jêr dest pê dike heta Çiyayên Hemrînê didome. Herêma duyem; Cezîrê tê gotin jê re ku dikeve Rojavayê Îraqê. Herêma sêyemîn; Herêma Çiyayî ye.

Dema erdnasên serdema me qala Îraqê dikin bi dabeşkirina sê herêma çavdêrî dikin. Piştî şerê Cîhanê yê yekemîn, Îraq ji destê Osmaniyan derket. Îraq, Parêzgeha Mûsil Parêzgeha Bexda û Parêzgeha Basrayê ve hat dabeşkirin. Parêzgeha Mûsîlê ji jora Bexdayê dest pê dike û tevahiya Kerkûkê dixe nav xwe. Kerkûk tenê ji dema Osmaniyan heta ku Mûsil bibe Parêzgeh (1789) navenda Parêzgeha Şehrezorê bû.

**Ev Dîroka Bajêr e. Mirov Kerkûkê di warê Erdnigarî û Topografîk de çawa binirxî ne?**

Kerkûk bi erdnigariya xwe pir ciyawaz e. Bi Herêma Hemrînê dikeve navenda Başûrê Îraqê. Dîroknas di danasîna Kerkûkê de tu carî qala bajarekî Îraqî nekirine.

**Beriya Kerkûk bikeve bin îdareya Parêzgeha Mûsilê Meclîsa Bilind a Neteweyan Raportek amade kiribû. Di vê Raportê de qet qala Kerkûkê hatiye kirin ?**

Meclîsa Bilind a Neteweyan di sala 1924 an de ji bo gengeşiya di navbera Tirkiyê û Îngilîzan de heyetek şandiye Kerkûkê û di vê mijarê de raportek amade kiriye. Komîsyona Meclîsê di encama raporta xwe de diyar dike ku Îraq sê beş e. Beşa yekem; Herêma Îraqê, Beşa Duyem; Herêma Cezîrê, Beşa Sêyem; Herêma Kurdistanê. Di heman raportê de Îraq wiha tête tarîfkirin; Herêma Îraqê ji Tîkrîtê dest pê dike di Rumadî de derbas dibe heta Çemê Feratê ye. Yanî herêma navendî. Ev tê vê wateyê ku "Şingal, Hemrîn û Çiyayê Mekhûlê di nav herêma Îraqê de ne. Di beşa duyemîn a vê raportê de tê gotin ku; Ev herêm yanî Mûsil û Kerkûk tu carî nebûne deverên Îraqî. Lê belê Îngilîzan ji bo îknakirina Fransiyan xwestin Parêzgeha Mûsîlê bixin ser herêma Îraqê. Gelek sedemên vê yekê hene. Rezervên neftê û Etnografiya Herêmê çend ji sedemên vê yekê ne.

> Dema Parêzgeha Basra û Îraqê hat damezirandin hejmara şêniyan pirtir Şîe Mezheb bûn. Brîtanya, Qral Faysal wek Hikûmdarê Îraqê pesend kir. Lê Faysal Sune bû û Şîeyan ev yek qebûl nekirin û alozî derket. Brîtanya jî Parêzgeha Mûsîlê kir ser Îraqê da ku hejmara Şêniyên Îraqê bikevin dengeyekê

**Di Dîroka Kerkûkê de Şêniyên Bajêr bi Pirranî Kurd bûn. Lê Niha Ereb jî li Bajêr hene. Ereb çawa li Kerkûkê bi cîh bûne?**

Ger dewletek bi sedsalan bajarekî îdare bike hîç şiphe tune ye ku dê demografiya wî bajarî biguhere. Pêşî em qala Kerkûkê bikin ez ê qala Efrîqaya Bakûr bikim. Berî îslamiyetê çanda Efrîqaya Bakûrî Amazîng(Berberî) bû. Lê belê piştî çûyîna Ereban bi îslamiyetê re çand û zimanê Misir,Lîbya,Tûnis,Cezayîr û Fasê guherî. Niha ew jî mîna Herêma Kurdistanê daxwaza mafên xwe ji Fas'ê dikin.

Dema Îslamiyet hate Îraqê Ereb tenê li Îraqa jêr dijiyan. Piştî Îslamiyetê Ereban berê xwe dan herêmên di destên Kurdan de û demografiya Herêma Kurdistanê guhertin.

Nivîskarê Ereb yê Crîstiyan Konstantîn Zuyrek ; Di seranserê Cîhanê de cîhê herî kozmopolît ev der e. Bisilman, Êzdî û Crîstiyan tev bi hev re bi awayekî aştiyane dijîn.

Lê belê dema mirov ber bi Başûr ve diçe tenê Ereb û Çanda xwe hene.

Her wiha li Kerkûkê Tirkûman jî hene. Gelo ew kengî hatine û çawa bi cî bûne?

Piştî Şerê yekemîn yê Cîhanê, Osmaniyan hakimiyeta xwe li Îraqê winda kir û hakimiyet ket destê Dewletên Rojavayî. Dewletên Rojava ji bo ewlehiya xwe ketin pey çareseriyên cûr bi cûr. Baregehên leşkerî ava kirin û demografiya Kerkûkê guhertin ku aloziyan kêm bikin.

Padîşahê Osmanî Qanûnî Siltan Silêman dema Kerkûk dagir kir Hewlêr, Diyala, Kerkûk û Tilafer kir baregehên leşkerî. Di wê demê de gelek Leşkerên Tirk tevî malbata xwe ve hatin Kerkûkê û bi cîh bûn. Di dema Selçûkiyan de jî gellek Tirkûman ji Azerbaycanê hatin Kerkûkê.

Li Kerkûkê du cûre Tirkûman hene. Yek ji wan cûreya Şîe ye û bi zimanê Azerî diaxive. A din jî Sunne ye û zimanê wan jî Tirkî ye. Tirkûmanên Kerkûkê bi vî awayî li Kerkûkê man. Balkêş e ku Tirk dibêjin Kerkûk Bajarekî Tirkûman e.

**Li Îraqê tenê di sala 1957 an de hejmara Şêniyên Îraqê bi awayekî ciddî hatin jimartin. Li gor wê rapirsiyê hejmara Kurdên Kerkûkê çend kes bû?**

Ji dema dewleta Îraqê hat damezirandin ve heta îro hejmara Kurdan li Kerkûkê zêde bû. Hejmara endamên Encûmena Meclîsa Kerkûkê yên Kurd tim zêdeyî yên Ereb û Tirkûmanan e. Di dema Osmaniyan de paşayan dixwestin ku herkes bi Tirkî biaxive da ku kes bi çavekî neyênî li Tirkûmanan nenêre.

Rapirsîna 1957 î di nav rapirsînan de ya kêm-xirab bû. Ji ber ku rapirsînên din ji pirsa "Tu bi kîjan zimanî diaxivî" pêk dihatin. Li gor bersiva şêniyan hejmara netewan diyar dikirin. Pirsên mîna Tu ji kîjan Netewe yî? Kurdî? Erebî an jî Tirkûmanî? nedihat pirsîn. Di dema Osmaniyan de axaftina bi Kurdî cîhê şermê bû. Ji ber hinde jî Kurdan şerm dikir bi Kurdî biaxivin. Qet hewce nake em qala rapirsînên di 1965, 1977 û 1987 an de bikin jî.

Di sala 1957an de hejmara Kurdan li Kerkûkê ji %48.8, a Tirkûmenan ji %21.4 û gellek hindik jî Ereb bû.

**Pêşmerge ji % Çend Kurdistan kontrol kiriye?**

Niha xaka Kurdistanê %95 di bin kontrola Pêşmerge de ye. Lê belê ji bo Tilafer,Hewîce û çend Navçeyên Diyala divê Referandom bê kirin da dê girêdayî Herêma Kurdistanê bibin an jî Îraqê . Her wiha ger em nehêlin li ser war û milkên Kurdistanê mizakere bête kirin.

Baş tê bîra min; di sala 1970 de Nemir Mele Mistefa Barzanî piştî ji terorkirina Îraqê filitî rêhevalên wî gotin ger em dîsa bi Îraqê re şer bikin? Nemir Mele Mistefa wiha bersiv da; Nabe ji bo kesayeta xwe şer bikim lê dibe em ji bo Kerkûkê cardin li hemberî Îraqê şer bikin.

Îro li Kerkûkê hilbijartin bê kirin dê hejmara Kurdan çibe û ji % Çend şêniyên Kerkûkê Kurd in?

Hikûmeta Îraqê kengî dizanîbû ku dê li gor wê encama rapirsîna Kerkûkê derkeve rapirsîn dikir. Di dema Şoreşa Îlonê de hilbijartin hate kirin. Piştî têkçûyîna Şoreşa Kurdî di 1977an de rapirsîn hat kirin. Di sala 1987 de rapirsîn hat kirin. Di wê demê de şerê Îran-Îraq herî dijwar bû. Rapirsîn hat kirin ji ber ku piraniya Bajarên Kurdistanê di destê Îranê de bûn û Peymana Cezayîrê di rojevê de bû.

Piştî 2005 an ku destûra bingehîn a Îraqê hat pesend kirin ger di 2007 an de rapirsîna hejmara Şêniyên Kerkûkê bihata kirin lê mixabin Hikûmeta Îraqê paş ve xist. Paşî 2009 an de ger bihata kirin Hikûmetê wê jî paşî xist. Di dawiyê de ger di 2012 an de bikirana lê ew jî nekirin. Serokê rêxistinên Kurdistanê jî dengekî tûnd li hember vê helwesta Hikûmeta Îraqê dernexistin.

> Rapirsîna 1957'î di nav rapirsîna de a kêm xirab bû. Ji ber ku rapirsînên din ji pirsa "Tu bi kîjan zimanî diaxivî" pêk dihatin. Li gor bersiva şêniyan hejmara netewan diyar dikirin. Pirsên mîna Tu ji kîjan neteweyî yî? Kurdî? Erebî an jî Tirkûmanî? nedihat pirsîn. Di dema Osmaniyan de axaftina bi Kurdî cîhê şermê bû. Ji ber hinde jî Kurdan şerm dikir bi Kurdî biaxivin Di sala 1957 an de hejmara Kurdan li Kerkûkê ji %48.8, a Tirkûmenan ji %21.4 û gellek hindik jî Ereb bûn.

Îraq dema hat damezirandin cara yekem xwest ku demografî û topografiya Kurdistanê biguherîne. Bi taybetî jî piştî îlan kirina Îraqê Kurda piştgirî neda Dewleta Îraqê û bi Serokatiya Şêx Mehmûdê Hefîd(Berzencî) û Barzaniya li hember Îngilîza tevgera Kurdistanî amade kirin. Li Hember tevgera Kurdistanî Qral Feysel dest bi guhertina Herêmên Kurdî kir. Mînak Hewîce dema Îraq hat damezirandin ji %100 Kurd bû lê niha ji %100 Ereb e. Niha jî ew deverên Demografiya wan hatiye guhertin di destên Daîşê de ne mînak: Hewîce. Piştî rizgarkirina Hewîce ji Daîşê ger li gor asasê maddeya 140î referandom bê kirin.





**HOŞENG OSÊ**

## Tevgera Apociyan û rêjîma Esad: Evîna ji aliyekî - II

Di xeleka borî a nivîsê de, min da zanîn bê Ocalan derbarê rewş û rûdanên Sûrî de çi got û çi ji PKKê xwest û helwesta PKKê ji serhildana li dijî rêjîma Esad çawa bû û çima hat guhertin? Di destpêka bûyeran de PKKê digot: "Em ne digel rêjîmê û ne jî digel opozîsyonê ne, em digel mafên xwe ne. Em xeta sêyemîn in". Lê di van 5 salên dawîn de, PKK-PYDê gelek alîkarî û xizmeta rêjîma Esad kirin. PKKê hinceta xwe ji bo bêalîkirina Kurdên sûrî û dûrxistina wan ji Şoreşa Sûrî, wisa digot: "Em herêmên rojavayê Kurdistanê ji wêrankirin û hilweşandinê diparêzin û nahêlin rêjîma Esad; Qamişlo, Kobanê û Efrîn...hwd bike weke Heleb, Humus û Reqa...". Ne tenê wisa jî, PKKê hemû kes û partiyên Kurd ku tevlî xwepêşandanan dibûn, wan bi kirêgirtî û girêdana bi Erdogan ve tawanbar dikirin ku dixwazin bajarên "Rojava" bidin ber bombeyên Esad û birûxînin. Lê di heman demê de, PKKê Amed, Cizîr, Nisêbîn...hwd dan ber agir û bombên rêjîma Tirk dema ku "Xweseriya Demokratîk" li bakur îlan kir!. Ango, PKK li binxetê aştîxwaz û rêformîst û"Gandiyê Hindistanê" bû, lê li serxetê Ernesto Che Guevara bû!. Di dawiyê de, ev derewa mezin jî eşkere bû.

Pirsa sereke ev e: PKK ji bo ku xwe bi rêjîma Esad re bide qebûlkirin, çima ewqas gelê Kurd li Sûriyê dike alav û êzing?!. Ji bo em bersiva vê pirsê bibînin, divê em vegerin sala 1996an. Di wê salê de, rojnamevanê ereb yê sûrî Nebîl Mulhêm hevpeyvîneke dirêj bi Ocalan re çê kir û di pirtûkekî de bi navê "Serokek û Miletek: Hefteyeke ligel Apo" hat çap kirin. Ew pirtûk ji bo zimanê tirkî nehat wergerandin, lewma gelê me li Kurdistana bakur daxwuyaniyên Ocalan yên şaş û nebaş ên derbarê doza Kurd li Sûriyê nas nakin û nizanin bê "serokê netewî" û "serokê gelê Kurd" çiqas heqaret li hebûn, dîrok û doza gelê Kurd li Sûriyê kiriye û bê çiqas pesnê rêjîma Hafiz Esad daye!?. Di wê hevpeyvînê de Ocalan hebûna Kurdan weke gel li Sûriyê nas nake û hebûna beşek ji Kurdistanê li Sûriyê qebûl nake û di rûpelên 167 û 168 ji wê pirtûkê, wisa dibêje: "Di derbarê Sûriyê de, piraniya gelê Kurd li Sûriyê koçber in, ji Kurdistana bakur hatine. Hinek kes hene behsa têgeha Kurdistana Sûriyê dikin, lê di baweriya me de, pirsgirêkên asê û aloz di vê mijarê de nîn in. Ev têgeh ne objektîv û rast e. Ya rest ew e ku em bêjin; Kurdên Sûrî ne Kurdistana Sûrî. Ev Kurd, ji zilm û zordariya Osmaniyan û komara Tirk reviyane (...) eger em li dîroka wan ku tenê vedigere 150 salî binêrin, em dê bibînin ku piştî têkçûna serhildanan, ew reviyane û hatine Sûriyê û hinek ji wan, ji ber sedemên civakî reviyane (...) Ez tekez dikim; ew ji bakur hatine. Ya girîng ew e ku ev Kurd, weke ermen û çerkezan in, ew jî kêmnetew in. Di destpêka hatina min ya bo Rojhilata Navîn de, min got: Divê em koçberiya ber bi başûr ve rawestînin û dest bi koçberiya ber bi bakur ve bikin".

Rojnamevan ji Ocalan dipirse: "Mebesta te ji koçberiya ber bi bakur ve çiye!?", Ocalan dibêje: "Di vî warî de, me dest bi prose û têkoşîneke dijwar û dirêj kiriye. Me berê Kurdên Sûrî daye çiyayên bakur, devera ku jê hatine Sûriyê. Bawer dikim ku rêjîm û Kurdên Sûrî ji vê yekê razî ne".

Tenê wateyeke gotinên Ocalan heye ku PKKê ji salên 1990î ve û ji bo xatirê çavên rêjîma Esad, planên guhertina demografîk û paqijkirina rojavayê Kurdistanê ji Kurdên Sûriyê pêktîne. Ji ber ku ma encama koçberkirina Kurdên Sûrî ber bi bakur ve, ji bilî guhertina demografîk û erebkirina herêma rojavayê Kurdistanê dê çibe!?.

Ocalan di wê pirtûkê de bi van hevokan pesnê Hafiz Esad dide: "Serokatia Esad tê wateya mezinbûna Sûriyê. Niştimanperweriya mezin di serdama Esad de li Sûriyê peyda bûye. Eger serokatiya Sûriyê were guhertin, dibe ku Sûrî, li ser asta netewî û tayîfî, perçe bibe. Ev jî tê wateya tunebûna Sûriyê. (...) Kurdên Sûrî, li ser asta hejmara tevahiya Kurdan ji %5ê jî kêmtirin û ji bakur hatine. Eger dewetekê dixwazin, divê berên xwe bidin bakur".

Ji axaftinên Ocalan baş diyar dibe û tê têgihiştin ku PKKê û Ocalan, ji salên 1990î ve, Kurdên Sûrî ji maf û doza wan ya sereke dûr xistin û berê wan dan bakur. Ev jî gelek gelek diket xizmeta rêjîma BAAS û Esad. Ji ber ku bi rastî tu wate ji gotinên Ocalan re nînin, ji bilî ku PKKê ji salên 1990î ve planên guhertinên demografîk li herêma rojavayê Kurdistinê pêk bîne û herêmê ji Kurdan paqij bike, tenê ji bo xatirê çavên rêjîma H. Esad.

Ji ber acizî û nerazîbûna gel a di derbarê van gotin û nirxandinên Ocalan yên wê çaxê, PKKê ev pirtûk ji nav gel berhev kir. Bi kurtî be jî, li gorî dîroka PKKê li Sûriyê, her tim, PKK ketiye xizmeta rêjîma Esad û Kurdên Sûrî kiriye qurbanên peywendî û berjewendiyên bi rêjîma BAAS - Esad re.

# Siyasetmedarên Rojava: Referandom mafekî rewa ye



**ZERYA PÎRANIJE**

Heftenameya Basê di derebarê referandomê de bi siyasetmedarên Rojava re axivî. Siyasetmedaran diyar kirin ku referandom mafekî rewa ye.

**DESTHILATDARIYA** Herêma Kurdistanê ev demeke dirêj e ji bo Referandoma Serxwebûnê amedekarî û hevdîtinan dike. Lê bi destpêkirina operasyona Mûsilê amedekariyên referandomê hinekî giran hatin birêvebirin. Tevî vê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û rayedarên Herêmê di hevdîtinên xwe yên dîplomatîk de hertim serxwebûna Kurdistanê dianîn zimên. Serok Barzanî di 31ê Adar 2017an de di hevdîtina xwe ya bi Serokê NY Antonio Guterres de behsa referandoma Herêmê kir û got: "Wê di demeke nêzîk de referandom bê li dar xistin. Hemû cîhan wê fêr bibe ku xelkê Kurdistanê derbarê sibêroja xwe de çi biryar dane. "

Piştî gotinên Barzanî li Herêmê demildest amedekarî û hevdîtinan dest pê kir. Qonaxa yekem a hevdîtinên partiyên siyasî ên Başûr bûn. Di bin serokatiya Serok Barzanî û bi beşdarbûna endamên Politbûroyên PDK û YNK di 2ê Nîsanê de civînek hat li dar xistin, PDK û YNK biryar dan ku îsal referandoma serxwebûna Kurdistanê were çêkirin. Piştî vê ji bo referandomê komisyonek ava kirin.

PDK û YNK di 3ê Nîsanê de serdana Yekgirt û Îslami ya Kurdistanê (Yekgirtu) û Komela Îslam a Kurdistanê (Komel) kirin. Bi hev re civiyan Yekgirtû û Komel piştevaniya xwe ragihandin. Lê Tevgera Gorran şandeya PDK û YNKê red kir û nexwest bi wan re rune.

**Şandeya Kurdistanê li Bexdadê ye**

Şandeya PDK û YNKê ku ji Serokê Dîwana Serokatiya Kurdistanê Fuad Husên, Sekreterê Polîtburoya PDKê Fazil Mîranî û Endamê Polîtburoya YNKê Ednan Muftî pêk tê, di 5ê Nîsanê de çûn Bexdayê û bi Serokomar Fuad Mehsûm û Serokê Parlamentoyê Selîm Cibûrî û bi serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî re li ser referandomê civiyan. Ji ber ku hevdîtinên şandeyê berdewam dikin, derbarê encama civînan de tu zanyarî ne hatin ragihandin.

Di derbarê referandomê de ji Rûsyayê daxuyaniyek hat. Nivîskarê Rûs Dmitry Nersesov di malpera Pravda de aşkere kir ku pêwistiya Amerîka û Îsraîlê bi Kurdistaneke serbixwe heye û wê li başûrê Kurdistanê ava bibe.

Hevseroka Meclîsa Sûriyê ya Demokratîk Îlham Ehmed û Serokê Encumena Xwecihî ENKSê Mohsîn Tahîr referandoma serxwebuna Kurdistanê ji Basê re nirxandin.

**Ehmed: Heger îttifaqek çê bibe, dê referadom jî çê bibe**

Hevseroka Meclîsa Sûriyê ya Demokratîk Îlham Ehmed da zanîn ku gelê Herêmê çi bixwazin dê wisa bibe. Ev mafê wan e û tenê ew bi xwe dikarin biryara xwe bidin û helwesta xwe ji bo sibêroja xwe diyar bikin. Heger gelê Herêmê referandom û serxwebûnê bixwazin, divê referandom bê çêkirin. Daxwaza Kurd, ereb û tirkmenan girîng e.

Ehmed axaftina xwe wisa domand: "Di hundirê herêmekê de îttifaqa gelan gelekî gîring e. Divê gelê Herêmê di nav xwe de îttifaqê çê bikin û li hev bikin. Îran û Tirkiyê li ser vê siyasetê dikin. Gelek hêzên qewî dijberiya referandomê dikin. Ji ber vê mijareke pir hessas e. Helbet azadî ji hemû tiştan bi nirxtir û hêztir e. Azadî hertim ji bo gelê Kurd girîng bû û girîng e. Ji bo pêkhatiyên herêmê jî mijara azadî, mijareke girîng e. Ez dikarim derbarê vê de wisa bêjim heger îttifaqek çê bibe, dê referandom jî çê bibe."

**Tahîr: Referandom ji bo gelê Kurd ê Başûr mafekî rewa ye**

Serokê Encumena Xwecihî ENKSê Mohsîn Tahîr derbarê referandomê de wisa got: "Referandom ji bo gelê Kurd ê Başûr mafekî rewa ye. Xala 140î a Destûra Bingehîn jî vî mafî dide gelê me. Referadom dê çi bibe û gel dê çarenûsa xwe bi îradeya avabuna Kurdistanê bi cih bike. Em weke ENKS dibinîn ku divê gel çarenûsa xwe bide diyar kirin. Ne tenê Kurd, hemû pêkhateyên wê derê çi mesihî, çi êzdî, çi ereb, çi asur çarenûsa xwe diyar bikin. Divê ev hemû bi hev re piştevaniya referandome bikin."

## PARTIYÊN ROJAVA: KERKÛK PARÇEYEK JI KURDISTANÊ YE

Qudusa Kurdan, Kerkûk weke mijara referandomê bûye mijara sereke ya Hewler, Bexda û cîhanê. Waliyê Kerkûkê Necmedîn Kerîm di 14ê Adara 2017an de ferman da ku li hemû saziyên fermî yên Kerkûkê ji bilî Ala Iraqê, Ala Kurdistanê jî bê bilind kirin. Ev biryar di Meclîsa Parêzgeha Kerkûkê de jî hat rojevê û biryar tevî boykota tirkmenan û nebeşdarbûna nûnerên ereban bi dengê 26 endamên Kurd hat qebûl kirin û piştre Ala Kurdistanê li Kerkûkê hat bilind kirin.

Bi bilindkirina Ala Kurdistanê, Walî Kerîm got: "Em ê pewendiyên xwe bi kesên ku beşdarî vê biryarê nebûne, xûrttir bikin." Tirkmên û rayedarên Bexdayê nerazîbûn nîşan dan. Serokomarê Iraqê Fuad Masum bal kişand ser xala 140î a destûra bingehîn û wisa pê de çû: "Bila hemû alî giredayî destûra bingehîn bibin."

Meclîsa parêzgehê biryara referandomê da

Parlamentoya Iraqê piştî vê rûniştinek li dar xistin û biryara Meclîsa Parêzgeha Kerkûkê nas nekir û biryar da ku divê tenê Ala Iraqê li avahiyên fermî bê bilind kirin. Parlementerê Kurd ev yek qebûl nekirin û meclîs boykot kirin. Meclîsa parêzgehê li dijî Bexdayê civînek li dar xist û biryara referandomê girt. Civîn dibin serokatiya Serokê Meclîsê Rêbwar Talebanî dest pê kir. Endamên tirkmen û ereb di civînê de cih negirtin. Lê bi piraniya dengan biryara Parlementoya Iraqê hat red kirin û bi piraniya dengan jî biryara pêkanîna referandomê li parêzgeha Kerkûkê hat qebûl kirin û daxwaz ji hikûmeta Iraqê hat kirin ku referandomê li wê parêzgehê pêk bîne. Her wiha di civînê de xala 140î jî hat nîqaş kirin. Beşdarvanan destnîşan kirin ku destûra bingehîn êdî bandora xwe winda kiriye.

Kî/ê çi got?

Dema ku Ala Kurdistanê hat bilind kirin û Meclîsa Parêzgeha Kerkûkê jî biryara referandomê da, Iraq, Îran û Tirkiyê nerazîbûnên xwe nîşan dan û rexne kirin. Berdevkê Wezareta Derve Behram Kasimî diyar kir ku bilindkirina Ala Kurdistanê derveyî destûra bingehîn a Iraqê ye.

Serokomar Recep Tayyip Erdoğan roja sêşemê di axaftina xwe ya li parêzgeha Zonguldakê got: "Ez li Kerkûkê ji bilî Ala neteweyî alake din xelet dibînim. Ez bangî Desthilatdarê Herêma Kurdistanê dikim ku demildest ji vê xeletiyê vegerin."

Her wiha rexneyek jî ji aliyê Serokê Koalisyona Neteweyî ya Şîî ya Iraqê Ammar Hekim ve hat. Hekim ragihand ku divê al bê daxistin.

Serokwezîrê Iraqê diyar kir ku ev deh sal e Ala Kurdistanê li Kerkûkê heye û ev mesele ji aliyê çapemeniyê ve hatiye mezin kirin.

Bandora Kerkûkê a li ser Ninovayê

Biryara Kerkûkê ji bo parêzgeha Ninovayê bû mînak. Parlamenterê Iraqê Selim Şebekî ji Meclîsa Parêzgeha Ninovayê daxwaz kir ku li herêmên ku di sînorên Ninovayê de cih digrin û têne nîqaş kirin, referandom bê pêk anîn û Ala Kurdistanê li wan dera jî bê bilind kirin û pêşmerge bêne bi cih kirin. Şebekî da zanîn ku divê ji niha ve di çarçoweya xala 140î de Ala Kurdistanê bê bilind kirin.

Endamê Emîndariyê Giştî yê ENKSê Qasim Şerîf û Nûnerê TEV-DEMê Aldar Xelîl bilindkirina Ala Kurdistanê û biryara referandoma Kerkûkê ji Heftenameya Basê re nirxandin.

Şerîf:Kerkûk beşekî Kurdistanê ye

Endamê Emîndariyê Giştî yê ENKSê Qasim Şerîf derbarê Kerkûkê de wisa got: "Em weke ENKS li Rojava biryara meclîsa Kerkukê di cih de dibînin û em ji sedî sed piştevaniya wan dikin. Divê ji bo xala 140î çareseriyek bihata peyda kirin. Ev maddedi nava 12 salan de hatiye pûç kirin. Kerkûk beşekî Kurdistanê ye û em dizanin di dilê her Kurdî/ê de ye. Wê îqlîma Kurdan, dê vegere ser Herêma Kurdistanê. Kerkuk dê di demek nêzde were ser Kurdistanê. Pêkhatiyên Kurdistan û Kerkûkê jî dixwazin Kerkûk bibe beşek ji Herêma Kurdistanê.Ez bawer nakim kesên ku dijberiya wê dikin serbikevin. Kerkûk wê giredayî Kurdistanê bibe û Ala Kurdistanê jî hertim li wê derê bê bilind kirin."

Xelîl: Kerkûk parçeyek ji Kurdistanê ye

Nûnerê TEV-DEMê Aldar Xelîl ji Basê re diyar kir ku bilindkirina Ala Kurdistanê û referandom kêşeyek giştî ya Herêmê ye. Heger em vê weke dewlet netew bigirin dest, tu kêşeyên Rojhilata Navîn çareser nabin. Li Kerkûkê îro gelek pêkhate hene û parçeyek ji Kurdistanê ye. Hewce ye Kerkûk weke parçeyekî Kurdistanê bê qebûl kirin. Çareseriya herî baş ew e ku tevahiya gel wê tê de bibînin.

Proseya Serxwebûnê:

# Divê dewletên cîran ji biryara Kurdan re hurmetkar bin



Divê Kurd ji bo serxwebûn û azadiyê destûrê ji tu kesî nexwazin. Wexta ku Kurdistan parve kirin wê demê kesî pirs ji Kurdan nekir. Heta îro jî mafê Kurdan yê hemwelatiyê jî nas nekirin. Ji ber wê divê Kurd di vê merheleyê de gavan paş de neavêjin. Mafê Kurdistana Başûr heye ku bi serê xwe, xwe îdare bike û bibe dewleteke serbixwe

■ **JÎN MAZÎ**

**ROJEVA** başûrê Kurdistanê referandoma bo serxwebûna Kurdistanê ye. Ev demek dirêje Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ji bo cîhan piştgiriya serxwebûnê bike bi welatên Ewropa,Amerîka û welatên cîranê başûrê Kurdistanê re dîplomasiyek berfireh digerand. Sekreterê Partiya Sosyalîsta Kurdistanê (PSK) ê Mihemedê Hecî Mehmud di daxuyaniyeke xwe de gotibû; ''Neteweyên Yekbûyî heta astekê razîne serpereştiya referandomê bike. Serok Mesûd Barzanî piştî dîplomasiya derve dest bi xebatên navxweyî kir bo li hember hikumeta Iraqê helwesteke xurt nîşan bide bi partiyên başûr re hin hevdîtin pêkanîn. PDK û YNK bi serpereştiya Serok Barzanî 2ê Nîsanê civiyan di wê civînê de referandoma serxwebûnê û bilindkirina ala Kurdistanê hat gotubêj kirin. Piştî vê civînê biryar hat dayîn şandeyek ku endamê wan ji herdu partiyan pêktê ji bo li gel aliyan gûftûgo bêkirin hat avakirin. Ev şande ji bo referandoma serxwebûna Kurdistanê piştgiriya partiyan bistîne,serdana Yekgirtuya Îslamiya Kurdistanê, Partiya Komunistên(Şiyoî) Kurdistanê,Komela Îslamiya Kurdistanê û Bizava Îslamî ya Kurdistanê kir. Şandeyek din jî serdana Bexdayê kirin. Di wê serdanê de Serokkomarê Iraqê Fûad Mehsûm,serokwezîr Heydar Ebadî û serokê parlementoyê Selîm Cibûrî û bi nûnerên Tevgera Sadr re civiyan. Ji aliyê din hikûmeta Tirkiye li ser bilindkirina ala Kurdistanê li Kerkûkê û biryara Encûmena Parêzgeha Kerkûkê ya bo referandomê bertekên tund nîşan dan û gotin ev nayê qebul kirin. Çar partiyên bakurê Kurdistanê PAK,PDK-Bakur, PSK û Hereketa Azadî di daxuyaniyek hevpar de gotin ''Em bi meşa serxwebûnê ya gelê me yê başûr û Hikûmeta Herêma Kurdistanê re ne''. Gengeşî nîqaş û piştgirîyên li hember referandoma bo serxwebûna Kurdistanê roj bi roj berdewam dike niha çavê hemu Kurdan li başûrê Kurdistanê ye, bê wê encamek çawa derkeve? Liser referanduma serxwebûna başûrê Kurdistanê Parlementerê HDPê Altan Tan,Nivîskar û dîroknas Tahsin Sever û cîgirê serokê Hak-Parê Abdulmenaf Kiran nêrînên xwe bi Heftenameya Basê re parvekirin.

**Li Rojhilata Navîn heta Kurd negîhêjin mafê xwe aştî û aramî çênabe**

Dîroknas û Nivîskar Tahsîn Sever liser dîroka Kerkûkê û statuya wê fikrên xwe wiha tîne ziman; Kerkûk bajarekî Kurdistanê ye di belgenameyên Osmaniyan de jî diyar e. Minaqaşeyên ku liser vê tê kirin bingeha wan tuneye Şemsettin Sami yê Lûgata tirkî ya yekemîn çêkiriye di ferhengê de dibêje ''Kerkûk bajarekî Kurdistanê ye'' ev kes bi xwe tirk e. Ev gengeşiyên liser vê meseleyê tê kirin yên siyasî ne, ne gengeşiyên ku rastî ya wan an dîroka wan heye. Her milletek mafê wan heye ku qedera xwe bi xwe tayîn bike ev ne meseleya Kurda tenê ye ev peymaneke navnetewî ye ji aliyê Neteweyên Yekbûyî jî hatiye pejirandin di hemu peymanên navneteweyî de ev hatiye destnîşankirin her millet qedera xwe bi destê xwe tayîn dike. Mixabin di vê meselê de dereng man ev derengiya wan ne di destê wan de bû. Nivîskarên Kurd dibêje neheqiyek navneteweyî li Kurdan hatiye kirin û divê ev neheqî were çareserkirin û Kurd mafên xwe yê neteweyî bidestbixin. Dîroknasê Kurd êrîşa Daişê ya li hember başûr dinirxîne û dibêje Di sala 2013a êrîşa Daişê ya li hember Kurdistana Başûr li pişt wê hin dewlet hebûn armanca wê êrîşê jî pêşîgirtina pêvajoya serxwebûna Kurdistanê bû. Di 2013a jî ev pêvajo hatibû rojevê ji bo referandom çêbibe û Kurd liser qedera xwe biryarekê bistîne lê ev êrîş pêk hat. Pêvajo dereng ket lê Kurdan du xalên girîng îspatkirin yek ji wan pêşmergeyan ax û welatê xwe bi xwîna xwe parastin hezarûsed km axa xwe azad kirin ev yek nîşanî hemu dinyayê dan ya diduyan civata Kurdistanê civateke sekuler e,ji her olî ji her kêmolî re ji her mezhebî û kêmneteweyan re bi tolerans e zilm û zordariyê di vî warî de li kesî nake wan nîşanî dinyayê dan ku Kurd him ji aliyê olî,siyasî ne fanatîk in,naşibin ereb û îraniyan cûdahiyek wan ji vî alî de heye. Vê tesîreke pozîtîf çêkiriye êdî dinyayê qebul kiriye Kurd li Rojhilata Navîn bi hêz in û dikarin welatê xwe biparêzin wek siyasî jî roleke girîng lîstin.

Sever helwesta dewletên cîran li hember pêvajoya referandomê jî wiha dinirxîne; Divê dewletên cîran ji biryara Kurdan hurmetkarbin ev mafê Kurdaye tu millet berjewendiyê xwe bi berjewendiyê milletekî din naguherîne. Li Rojhilata Navîn heta Kurd negîhêjin mafê xwe aştî û aramî çênabe.

Cîgirê Serokê Hak-Parê Abdulmenaf Kiran derbarê referandoma başûrê Kurdistanê ramanên xwe ji Basê re anî ziman: Divê Kurd destûrê, ji bo serxwebûnê ji kesî nexwaze. Wexta ku Kurdistan parvekirin wê demê kesî pirs ji Kurda nekir. Ji ber wê divê Kurd de paş de gav neavêjin. Mafê Kurdistana Başûr heye xwe îdare bike û bibe dewleteke serbixwe. Îro di Rojhilata Navîn de gelek dewlet hene ku nifûsa wan ji 2 milyona jî kêmtir e bi kêmasî nifûsa Kurdistana Başûr dora 7 milyona ye. Dewleteke bi çavkaniyên xwe yê bin erdê û ser erd bi yê beşerî û mirovatî jî biqasî dewleteke serbixwe heye. Em wek Hak-Parê piştgirê serxwebuna Kurdistanê ne. Kiran derbarê statuya Kerkûkê jî wiha amaje kir; Îro li Tirkiyê li Stenbolê nifûsa Kurdan ji 4 milyona zêdetire lê ev nayê vê maneyê ku Stenbol bajarê Kurdaye. Li Kerkûkê tirkmen,ereb,keldanî hene û hinek kêm netewên din jî hene lê ev nayê wê maneyê ku axa Kerkûkê ne axa Kurdistanê ye. Îro em dibînin ku dewletên Yekîtîya Ewropa,Emerîka û Yekbûna Netewî ji bo dewletek azad û serbixwe ya Kurdan amade ne. Dewletên cîranê Kurdan jî divê xwe ji vî tiştî re amade bikin. Divê Kurd ji ber gefê wan dev ji berjewendî,maf û azadiya xwe bernedin.

Kerkûk dilê Kurdistanê ye, bajarekî Kurdistanî û dîrokî ye. Di belgenameyên Osmaniyan de jî diyar e. Minaqaşeyên ku li ser vê têne kirin bingeha wan tuneye. Şemsettin Samiyê ku yekemîn Lûgata Tirkî çêkiriye di ferhengê de dibêje; ''Kerkûk bajarekî Kurdistanê ye'' ev kes bi xwe tirk e.

**Li Rojhilata Navîn tu projeyên Tirkiye tuneye**

Parlementerê HDPê Altan Tan derbarê Kerkûk û referandomê nêrînên xwe bi Heftenameya Basê parvekir û got: Li gor fikra min xala 140î ya destura bingehîn a Iraqê, ji bo statuya Kerkûkê divê referandom çê bibe lê bi salane ev referandom pêk nayê. Ji bo çi pêknayê? Ji ber ku li Kerkûkê bêhtir Kurd hene,tirkmen,ereb hêzên ku naxwazin Kurd statuyekê bi dest bixin vê dibêjin, ji bo li Kerkûkê bi cîh bikin ji derve Kurd anîne û demografiya Kerkûkê guhertine û dibêjin divê ewil jimartina nifûsê bêkirin piştre divê referandom pêkbê. Lê vê yekê hertim paşguh dikin. Divê ev referandom herî dereng di 2007an de bihata çêkirin. Ez vê dibêjim divê jimartina nifûsê pêkbê. Lê ev pêk nayê ji ber ku dema jimartin çêbibe dê heman encam derkeve. Niha kî li Kerkûkê dijî ew kes xwediyê mafê xwe ne. Li Kerkûkê gelek caran hilbijartina giştî hat çêkirin di hilbijartinê berêkê raya xwe bikaranîbe kêmanî bila ew weke dengdêr were qebulkirin ji ber ku wan parlementer hilbijartiye û şandine parlementoya Bexdayê. Referandoma yekem bo statuya Kerkûkêye,Kerkûk dê bi Bexdayê ve bêgirêdan an bi Erbîlê? Piştî ku statuya Kerkûkê diyar bû îjar dê liser serxwebûnê referandom pêk were heger bi Erbîlê ve bêgirêdan ev dê bêpirsîn hun serxwebûnê dixwazin an rêveberiyek federatîf ya bi Bexdadê ve girêdayî? Ev mijar ewqas zelal e,lê ji ber sedemên siyasî û derûdor,kesên ji bersiva Kurdan ditirsin,qebul nakin vê meseleyê dirêj dikin. Ez piştgiriya referandomê dikim bi kesên hilbijêr divê referandom bêkirin û çi encam derkeve divê rêz lê bêgirtin. Bertkên Tirkiye çewt in,niha li Rojhilata Navîn tu projeyên Tirkiye tuneye niha ji bo Kurd statuyekê bidest nexin liser siyasetek wisa dimeşin ev jî ne rast e, divê Tirkiye di vê referandomê de rêzê li biryara gel bigre.

**EKREM ÖNEN**



## Kerkûk: Osmanî, Înglîz, Ereb û Kurd

Wek tê dizanîn di serdemê Împaratorîya Osmanî de Kerkûk sancaxek wîlayeta Mûsilê bû.Di vê demê de,beriya şerê cîhanê yê yekemîn Mûsil bi teybet jî Kerkûk cihê balkêşiyê bû ji zirhêzên navnetewî re, bi teybet ji bo Almanî û Înglîza. Beriya şerê cîhanê yê yekemîn li ser parvekirina cîhanê nakokî di navbera zirhêzên navnetewî de hebû li Aliyekî Almanî, Austûrî-Macaristan û Îtalî, Osmanî jî nêzî vê blokê bûn. li aliyê din, bi tevayî û bi teybet liser parvekirina Împaratoriya Osmanî di navbera xwede, Înglîz, Fransa û Rûsya Qeyserî tifaqek bi dizî çêkirin paşê navê vê tifaqê kirin Sykes-Pîcot. Li gor vê tifaqa di perçekirina Împaratoriya Osmanî de İraqa îro ji Înglîzan re di mîne.

Çima Kerkuk hewqas gringe ?.

Ji ber geopolîtîk û bi teybet ji ber Kerkûk bajarekî Neftê ye, li gor lêkolînêk ku dezgehên Neftê yên Navnetewî li Kerkûkê çê kirine, rezervên petrolê li Kerkûkê 8,7 milyar (Bermîl)warîl e, her wiha ji % 6 hemû rezervên Nefta İraqê li Kerkûkê ye. Nuha ji % 40 nefta li İraqê der tê û diçe bazara cîhanê ji Kerkûkê ye. Ev tiştana yek ji sedemên asasî ye ku Kerkûk balkêşê ji bo zirhêzên navdewletî bi teybet îro dema li cihanê krîza enerjiyê heye.

Bi destpêka şerê cîhanê yê yekemîn dema Împaratoriya Osmanî zeîf bû, bi êrîşa hêzên Antant (Înglîz, Fransa û Rûsya Qeyserî) Osmanî anîn li vî sînorê Tirkiyê îro sekinandin. .Lê şer hin bi dawî nehatibû, peyman hîn nehatibûn imze kirin.Di vê serdemê de wek gelek milletan Kurdan jî doza mafê netewî dikrin. Li ser vê Îttîhadî Terakî û Mistefa Kemal bi Kurdan re dan û stendin dikirin da ku rê liber Kurdan bigrin ku Kurd nebin Dewlet û soz didan Kurdan (serî li Kurdan digerandin) ku ev Tirkiya îro wê di şertên wekhevîde a Tirkan û Kurdan be.. Lê Kurdan ji aliyekî Bi Tirkan re têkilî dikirin ji aliyê din ve bi Înglîz û Rûsa re têkilî dikirin ji bo avakirina Dewleta xwe. Bi ya min siyaseteke rast, netewî û pragmatîk dimeşandin. Ji ber Kurdan ne bawerî bi Tirkan dianî ne jî temamî bi Hêzên antant dianîn. Ji ber Tirk û Kurd bi hev hesîya bûn. Wek mînak, him di meclîs-î mebusan a Osmanî de him jî di millet meclîsa nû a Enqerê de pirsa Misak-î millî hate rojevê. M.Kemal di gotara xwe ya li Îzmîtê nîyeta xwe ya di derbarê Kerkûkê de eşkere dide rêdan M. Kemal weha dibêje '' Mûsıl ji bo me gelekî grînge, yek jê Musil gelek dewlemende ji alî neftê de, ya din jî Li dora mûsilê Îngilîz dixwazin dewletek Kurd ava bikin. Ku gelek ji bo me talûke ye, ev dewlet paşê dê tesîra xwe li nav me jî bike.'' M. kemal dizanîbû nikare wîlayeta mûsilê bixe nav axa Tirkye ya îro lê tevî wê jî wî doza Mûsilê dikir ji bo xapandina Kurda bû. Ji ber Kurd heta hêviya wan ji Îngilîz û hêzên Antant qut nebû ne dixwestin bi Tirkan re di nava dewletekê de bijîn, her dixwestin dewleta xwe ava bikin .dema hêviya Kurdan ji Îngilîz û hêzên Antant qut bû kû êdî nikarin bi serê xwe bibin dewletx westın bi Tirkan re li ser esasên wekhevî bijîn. Wek mînak gotara mebûsê Kurd yê Bîtlîsê Yûsif Ziya Begê Bîtlîsî li meclîsa Tirka Yûsif Ziya Beg fam kiribû ku M. Kemal êdî dev ji Musilê berdaye bes eşkere nake, li ser wê weha dibê ''Nabe Mûsil li derve bimîne, eve wê bibe pirgrêkek mezin him ji bo Kurdan her weha ji bo Tirkan. Heger em nikarin sancaxa Mûsilê bistînin lê divê em dev ji Kerkûk û Silêmaniyê bernedin (bi ya min Li vir esas Yusif Ziya Beg naxawaze Kurdistan perçe bibe derdê wî ne misak-î Millî ya Tirka ye. E.Ö) .

Ji peymana Lozanê heta peymana Enqerê a 5 ê hezîran a 1926 de pirsa Mûsilê gihîşt encamekê. Ji wê demê vir de pirsa Mûsilê bû pirsa navbera Înglîz û Kurdên Başûrê Kurdistanê. Heger em lê binêrin ji serhildanên Şêx Abdulselam Barzanî, Şêx Mehmûd Berzencî heta serhildana Şêx Ehmed Barzanî Kurdan serhildanê mezin li hember Îngilîz a ji bo mafê netewî kirin. Wek eşkereye piştî şerê cîhanê yê duyemîn dîsa neheqiyek dîrokî li milletê Kurd hate kirin, ku Kurd negihêjin mafê xwe yê netewî. .Lê pirsa Kerkûkê piştî şerê cîhanê yê duyemîn jî her pirsgirêk bû di navbera Kurdan û Ingilîz -İraqê de. Piştî cumhûriyeta Kurdistanê ku Mistefa Barzanî diçe Sovyet û di sala 1958 de vedigere ku piştî

du salên aşîtiyê di navbera Kurdan û hikumeta Bexdayê di sala 1960'de Kurdan bi serokatiya Mistefa Barzanî dest bi serhildanê kirin. Şer heta sala 1970 berdewam bû.

bi navbêçiya Sovyet di sala 1970 de peymana 11 adarê 1970 a otonomî hate îmzekirin. Di vê peymanê de Sovyetî bi Teybet Yevgenî Primakov navbêncî bû, ku di bîranînê xwe de wiha dibê. '' Barzanî qebul ne dikir kerkûk derveyî Kurdistanê bimîne. Bes ji Barzanî re got nabe em ji bo pirsa kerkûkê tenê, peymana Otonomî tevayî xera bikin. Ji Kurdan re baştire otonomî wergrin meşrutyeteke (Legîtımnost) navnetewî bigrin, pirsa kerkûkê bihêlin paşê bê çareserkirin''. Bi wî awayî Peymana 11 adarê hate pejirandin. Pişt re şer careke din dest pê kir, di vê demê de Seddam Husên dest pê kir Kurd ji Kerkûkê derxist ereb anîn bi cîh kirin, xwest demografiya Kerkûkê bi guhere. Piştî Rûxandina Sadam pirsa Kerkûkê biryar hat dan ku liser asasê maddeya 140î bête çareserkirin. Maddeya 140 bê fonksîyon ma. Di vê navberêde gelek Kurdên dema Seddam derketibûn vegeriyan. Niha meclîsa Kerkûkê biryarek dîrokî stand û bilindkirina ala Kurdistanê û çêkirina referandomê pesend kir. Konjuktura navnetewî gelek misaîde ji bo referandoma Kerkûk û serxwebûna Kurdistanê. Bêdengiya DYA, Rûsya û welatên Ewrûpî li hember birayara Kurdan, di dîplomasîyê de navê wê '' Em ne li dijin'' Tirkî û Îran nikarin bibin asteng. Tişta Kurd lê miqatebin ewe, Ku rê nedin Kerkûk bibe heremeke bi serê xwe, ji ber dikare pirsek wiha di qada navnetewî de bê rojevê. Her wiha Kerkûk vegere ser herêma Kurdistanê balansa qeweta li herêma Kurdistanê di guhere, divê ew nebe sebebê nakokiya nav mala Kurd. Niha konjuktur a navnetewî Ji Kurdan re misaîde ku Kurd bigihin armancên xwe, heger Kurd jî siyasetek pragmatîk û millî bimeşîn in.

# Rûhanî Kurdan tenê ji bo dengdanê dixwaze



Wî, kabîneya xwe weke raman û hêvî binav kiriye. Lê wisa xuya ye ku ramanên wan tenê ji bo darvekirin û girtinê bikar tên. Tevî ku parlamentoyê gotiye divê darvekirina bazirganên madeyên hişber nemîne, lê Rûhanî car din rûyê Komara Îslamî nîşan dide û dibêje ku Şêvra Bilind a Ewlekariya Neteweyî ti biryarek ji bo dawîanîna darvekirinê tinebûye.

ESKENDER CEIFERÎ

**HILBIJARTINÊN** serokkomariya Îranê nêzîk dibin. Aliyê ku xwe weke Eniya Reformê binav dike, di nava Kurdan de hertim dengên xwe bi şêwazên curbicur misoger dike. Bi nêzîkbûna hilbijartinêna vê gerrê yên serokkomariya Îranê jî liv û tevgerên wan di nava Kurdan de zêde dibin. Hesen Ruhanî serokkomarê Îranê ku ji wê eniyê ye, di demên nêzîkî hilbijartinê de serdana Rojhilatê Kurdistanê dike û vê carê jî çûbû bajarê Sine. Ebdulmihemed Zahîdî Waliyê parêzgeha Sine têkildarî serdana wî diyar kiribû ku serdan ji bo vekirina hinek projeyên aborî ye. Tevî ku pirsgirêkên Sipaya Pasdaran û rêxistinên ser bi wê ve bi Reformîstên nêzîkî Rûhanî re hene, lê dîsa jî wan rêxistinan, berjewendiya giştî ya Komara Îslamî parast û Rûhanî ji aliyê berpirsên bajêr û Besîc û Sipaya Pasdaran ve hat peşwazîkirin.

**Derfetên kar li Sine derewên ragihandinê ne**

Hesen Ruhanî gotiye ku ew derfeta kar ji bo şeş hezar ciwanan çê dikin û bi giştî zêdetirî milyarek Dolaran li wir ji bo ciwanan tê xerckirin. Gelek wezîran weke wezîrên karê petrolê, turîzim û hejmareke zêde ya berpirsên din di serdanê de şêwirmendiya Ruhanî dikirin. Lê ya balkêş ew e ku sozên wan, hemû yên piştî encamdana hilbijartinan in. Ew tê vê wateyê Ku destpêkê hûn deng bidin û pişt re emê ji bo we xizmetê bikin neku niha. Gelek navçeyên weke gundên girêdayî Sine, Seqiz, Dîwandere û Baneyê soza qîrkirin û nûjenkirina rê û piran ji wan berpirsan wergirtine. Piştî ku Hesen Ruhanî di sala 2013'an de bû serokkomarê Îranê, ev cara duyemîn e ku serdana bajarê Sine dike. Lê hêviyên çalakvanên sivîl bi wan serdanan û emcamên sozan, kêm in. Çavdêr balê dikişînin ser propagandeya hilbijartinê û dibêjin tevî ku serokkomar mukur nehatiye ku wê di hilbijartinan de bibe aliyekî hevrikiyê, lê dîsa tenê armanca wî dengên Kurdan in û dixwaze ji bo hilbijartinê yan ji bo xwe yan jî reformîstekî din, dengên Kurdan kom bike. Tevî wan sozan, lê rêjeya bêkariyê zêdetir e ji herêmên din yên Îranê.

**Partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî hertim ew hilbijartin baykot kirine.**

Ew jî ji xeynî behsa siyasetê, didin xuyakirin ku wî cara yekemîn gellek soz dabûn gelê parêzgehê ji ber wê jî çavên wan gellekî li rêya Rûhanî bûn. Lê li gor wan, xelkê tiştek ji kîska Rûhanî bidest nexistiye. Ji bilî partiyên Kurdî, siyasetvanên navxwe jî ji wî bi gazin in û Ehsen Elewî nûnerê Sine, Dîwandere û Kamiyaranê li parlamentoya Îranê ragihandiye ku Hesen Rûhanî soz û peymanên xwe bi cih neanîne û rêjeya bêkariyê li Sine 45 ji sedî ye û nediyariyê xelk xistiye nav bertengiyê de. Li gora Elewî, kabîneya Rûhanî, di serdana xwe de bo parêzgehê ti pirojeyên taybet dernexistine holê.

Çalakvan dibêjin Rûhanî îdiayê dike ku wan kariye tevî kêmbûna nirxa Petrolê, bihayê pereyên Îranê her weke xwe ragirin û aramiyê jî di bazaran de bi cih bikin. Lê haya wî ji birçî û hejaran tine ye. Karkerek di mehê de 600 hezar Tumenan distîne û kirêya xaniya wî bi kêmanî 400 hezar in. Wê demê aramiya bazara petrolê çi bi kêrî xelkê tê!

**Projeyên Kirmaşanê jî serkeftî nebûne**

Rûhanî ne tenê li Sine lê li parêzgeha Kirmaşanê jî sozên xwe bicî nekirine. Sozeke wî ew bû ku Kirmaşan wê bi bernameyên dewletê bi taybet di warê cotkariyê de rastî guhertinên mezin bê. Tîrmeha 2016'an, got ku parêzgeha Kirmaşanê wê di warên, geştiyarî, pêtroşîmî, av, têknolojiyên nûjenkirin û çandî de pêş bikeve û 45 plan, wê ji bo geşepêdana Kirmaşanê werin bicihkirin. Lê niha piştî salekê, tenê 18 ji wan planan destpê kirine û pereyên projeyên din kes nizane çûne kuderê! Li gora wî, Kirmaşan wê bibe yek ji çavkanî û navendên petrokîmiyayê ku bi taybet di warê pêşeyên jêrdestî de gelek derfetên kar û xebatê ji bo ciwanên wê parêzgehê bên dabînkirin. Li wê parêzgehê jî tenê dengê Kurdan ji wî re pêwîst bûn. Ew hebûna ewlehiya zêde, weke encama têkbirina partiyên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê dibîne û ji bo tevlîhevkirina refên wan partiyan, gelek bûdceyan terxan dike. Ew dibêje yekîtiya di navbera qewm, etnîk û mezheban de û bikaranîna berpirsên biyanî li parêzgeha Kirmaşanê, wê sermayedanînê li vê parêzgehê bi awayekî berbiçav zêde bikin. Bi vê yekê berpirsên pilebilind jî Kurd nîn in.

**Sembolên Kurdan propagendeyên hilbijartinên Îranê ne**

Hesen Rûhanî dema ku serdana Urmiyê kir bêyî ku behsa pirsgirêkên parêzgehê bike got ku wan Hewlêr parastiye. Herêma Kurdistanê jî ev îddayên Rûhanî bê bersiv nehêlan û ragihand ku ew spasiya kesên ku alîkariya Kurdistanê kirine, dikin û eşkere kirin ku gelê Kurd û Pêşmergeyan axa Kurdistanê parastiye. Li gor çalakvanan bi vê jî xuya dibe ku reformxwaz jî weke hemû şaxên din yên Komara Îslamî, tenê dengê Kurdan dixwazin. Gelo mafê wan hemû welatiyên Kurd li Rojhilat tine ye Ku berpirsekî pilebilind di dewletê de hebin?! Wî li Urmiyê ji Kurdan pirsî ku herî zêde Kurd li kuderê di nav ewlehiyê de ne û bixwe jî bersiv da ku Kurd herî zêde li Rojhilat di nava aramî û ewlehiyê de ne! Rûhanî xelkê Urmiyê wekî xelkê netirs û sînorparêz binav kir û got ku emê hejaran li wê parêzgehê nehêlin û her kes bibe xwedî mal û milk. Lê ew soz jî tenê bûne para propagende û kaxezan. Wî her çawan ku soz dabû wê rewşa aborî baş bike, lê kesî çi geşekirineke aborî nedît, vê carê jî got ku emê ji sînorê Temerçîn heya Bazerganê aboriya xelkê baş bikin.

Herwisa di dema hilbijartinên parlamentoyê de, rewş li parêzgeha Urmiyê ji berê cuda bû. Ji bo ku rêjeya beşdariya xelkê di proseya dengdanê de zêde bibe, mifah ji slogan û sembolên Kurdan hatibû standin. Bikaranîna stranên Kurdî yên şoreşgêrî di dema propagendeyê de, yek ji mînakên herî berbiçav e. Niha jî bi kincên Kurdî, hin kes mijûlî komkirina dengan in ji bo Rûhanî û reformîstan. Ji ber vê siyasetê jî reformxwazan heya niha gelek deng li Rojhilat bi dest xwe ve anîne.

Navbirî di derbarê hewlên xwe de ji bo vejandina gola Urmiyê dibêje ew gol, 120 cm kêm bûbû, lê min qewl dabû xelkê Urmiyê ku ez wê golê ji mirinê rizgar bikim, lewra min soza xwe bi cih anî. Min karî 10 cm ava gola Urmiyê bi lihemberdan ligel sala 2014'an zêde bikim û niha jî em di nava hewlên berdewam de ne bo zêdekirina ava hola Urmiyê. Lê berovajî gotinên wî, piştî heyekê dîsa asta avê kêm bû û xuya dibe ku zêdebûna ava golê, tenê ji ber barîna zêde ya baranê bûye neku ji ber veguhestina avê ji bo wir yan jî bidawîkirina çêkirina bendavan.

**Îlam li hemû Îranê hejartirîn e**

Hesen Rûhanî serokkomarê Îranê di serdanên xwe yên parêzgehên cuda de berê xwe dabû Îlamê jî. Li wir soz da çareyekê ji hişkbûna daristanên Berrûyê yên wê parêzgehê re bibîne. Zagrosa ku bi daristanên xwe ve naskirî ye, her sal ji berê zêdetir rastî şewat û hişkbûnê tê. Tê gotin ew bûdceya ku Rûhanî ji bo wê mijarê terxan kiribû, bûye para beşên cuda yên Sipaya Pasdaran. Derdora 8 milyar Tumenan (nêzîkî 3 milyon Dolaran) bûdce hatibû terxankirin lê heta niha ne parêzgarî û ne jî saziya parastina Jîngehê ya dewletê, rengê pere û bûdceyê nedîtine.

**Rêxistinên Sipaya Pasdaran li navçeyên Zagrosê ji xwe re navendên nû vekirin.**

Li parêzgeha Îlamê bi sedan hezar donim daristanên Berrûyê ber bi tinebûnê ve diçin lê wî bi neçarî soz da ku bûdceyekê ji bo çareserkirina hişkbûna darên Berrûyê yên Îlamê terxan bike ku negate xerckkrin.

Îlam ku weke "Bûka Zagrosê" tê naskirin zêdetirî 640 hezar donim daristanên wê zincîre çiyayê lixwe digire ku 90 ji sedî ji wan daristanan ber bi tinebûnê ve diçin. Li gorî agahiyên Navenda Parastina Jîngehê ya Îlamê, 10 ji sedî ji daristanên Îlamê ku dibe 640 donim bi temamî hişk bûne lê heta niha sozên di derbarê rizgarkirina Zagrosê de nehatine bicîkitin.

Hesen Rûhanî li Îlamê behsa xizmeta dewletê bi wî bajarî kir û got ku wan weke bajarên din yên Kurdistanê, xelk ji belavkirina madeyên hişber û hejariyê parastine. Lê li gora amarên navxwe, xelkê Îlamê ji dest hejariyê dinalînin û ew parêzgeh di asta Îranê de hejartirîn e.



Li gor çalakvanan bi vê jî xuya dibe ku reformxwaz jî weke hemû şaxên din yên Komara Îslamî, tenê dengê Kurdan dixwazin. Gelo mafê wan hemû welatiyên Kurd li Rojhilat tine ye Ku berpirsekî pilebilind di dewletê de hebin? Komara îslamî ji bo berjewendiyên xwe cil û bergên Kurdî û stranên Kurdî jî bikar tîne.

Her dema ku serokkomarê Îranê digihêje yek ji bajarên Sine, Kirmaşan, Urmiye yan jî Îlamê yê Rojhilatê Kurdistanê, tenê hilbijartin têne bîra xelkê. Ne soza bicîkirina yasayên di derbarê zimanê dayîkê dikevine holê û ne jî pêşwaziya wî ji aliyê rayedarên bajêr ve tê wateya pêşxistina bajar. Lê belê dengê herî kêm 8 milyon Kurdan jî bi kêrî wan tê ku zêdetirî milyonek kesan ji wan, mafê dengdanê hene.

Sala bihurî jî bi heman rengê îsal, li Sine ji aliyê parêzgar Zahidî, nûnerên Sine di Parlamentoya Îranê de û rayedarên din ên bajêr ve hatibû pêşwazîkirin û ji xelkê re got, hikûmet îro mêvanê gelê bi rûmet û wêrek yê Kurd e. Ji ber pêgeha girîng û bilind a vî gelî û warê hêja, me biryar da piştî rêkeftina etomî serdana Sine bikin û gelek pirsgirêkên wan çareser bikin. Lê negot ka gelo ew pirsgirêk çi ne û sedemên derketina wan çi ne! Wî diyar kiribû ku di serdanê de wê xwestek û pirsgirêkên gel bên guhdarîkirin û wezîr û rayedarên hikûmetê jî ku pê re ne, wê ji bo çareseriya pirsgirêkan alîkar bin. Eger em behsa pirsgirêkên siyasî nekin, bi kêmanî sedan gundan soza xizmetguzariyê ji Hesen Rûhanî wergirtine û Rûhanî jî li ser texta dewletê rûniştiye û guhdarekî baş e lê bicîkarekî baş nîn e.

# Li bazarên Enqereyê keda Kurdan heye!



Kurdên ku bi salan e li bazarên Enqereyê firoşkariya zerzewat û fêkiyan dikin karê xwe ‘gelek zor û zehmet’ bi nav dikin. Heke ne Kurd bin, tu kes nikare vî karî bike. Firoşkar dibêjin; tevî ewqas kedê em heqê xwe jî baş nagirin.



GÖNÜL GÜN

**KEDA** Kurdan li gelek bajarên Tirkan û di hin sektorên li van bajaran de gelek zêde ye. Xwîdana Kurdan li her cihî, carinan wek karkerê demsalî yê cotkariyê, carinan jî wek karkerekî înşaetê dirije.Yek jî ew e ku li bazarên Enqereyê karê firotina zerzewat û fêkiyan e. Kurd, bi piranî karê firotina zerzewat û fêkiyan dikin. Kurdên ku karê firoşkariyê li bazaran dikin dibêjin, ev kar fêdakariyeke mezin dixwaze û heta gelek caran xewa bi çend saetê ve li ser piyan dixebitin.

**“Ger ne Kurd bin, tu kes nikare vî karî bike”**

İsmail Özdenê sî û heft salî bi eslê xwe ji Gogsiya Erziromê ye lê li Enqereyê hatiyê dinê û mezin bûye. Özden dibêje ji heft saliya xwe heta niha ew vî karî dike. Wî ev pîşe ji bavê xwe hîn bûye û dibêje, “ger ne Kurd bin, tu kes nikare vî karî bike. Çimkî karekî wisa ye ku kedek zêde dixwaze û zehmet e.”

Firoşkarê Kurd diyar dike ku zerzewat û fêkiyên herî baş tên Enqereyê. Sedema vê yekê jî wisa tîne zimên, “Firoşkarên Enqereyê bi saya tecrûbeyên bi salan dizanin ku zerzewat û fêkiyên baş çawa ye, wê van tiştan ji ku derê, çawa berhev bikin û bînin vir, a rast merivên xwedî tecrûbe ne.”

**“Karê me, karê neçaran e”**

Harun Özdenê firoşkar ji Agiriyê ye û ji sala 1994’an û vir ve li Enqereyê dijî. Özdenê ku nêzî bîst salan e vî karî dike dibêje ev kar kedeke mezin dixwaze û wisa diaxive;

“Her çiqas bi salan e ez vî karî dikim jî dikarim vê yekê bibêjim karê me, karê neçaran e. Dem têra me nake. Em bêxew dimînin. Carinan em ji roja înê ji mala xwe derdikevin bes roja yekşemê diçin mala xwe. Ne hêsan e ku meriv gelek zerzewat û fêkiyan bigere, bibîne û van li bazarê bifiroşe. Helbet ez vê yekê bo Enqereyê dibêjim.”

**“Ez bi salan e bargiriyê dikim”**

Li bazarên Enqereyê ne bi tenê firoşkar heman demê piştîvan ango bargir jî hene. Mustafa Sonsuzê ku Kurdên Heymaneya Enqereyê dibêje ew bi salan e hemaltiyê dike û wiha didomîne;

“Ez barên muşteriyan an dibim wesayîtên wan an jî dibim malên wan. Hema her rojên hefteyê ez diçim bazaran û piştîvaniyê dikim.”

**“Karê firoşkariya zerzewat û fêkiyan, karekî komxebat e”**

Fatih Yavuz jî bi eslê xwe ji Gogsiya Erziromê ye û li Enqereyê hatiye dinê û mezin bûye. Yavuzê firoşkar ji yazdeh saliya xwe û pê ve vî karî dike û dibêje ev kar bi saya keda gelek kesan derdikeve holê. Firoşkarê Kurd, amaje dike hemû zerzewat û fêkiyên ku têne Enqereyê pêşî li hala komfiroşiyê ya Yenimahalleyê berhev dibe û wisa qala karê xwe dike;

“Karê firoşkariya zerzewat û fêkiyan, karekî komxebat e. Ji komê çend kes ji ber ku zerzewat û fêkiyên baş û teze bikirin nîvê şevê diçin halê. Firoşkar li gorî hewcedariya xwe li fêkiyan dinêre û dikire. Endamên komê yên din jî serê sibê tên cihê bazarê û dest bi avakirina dezgehê dikin. Piştî demekê zerzewat û fêkiyên ku hatine yek bi yek  paqij dikin û bi ber çavan re derbas dikin û datînin ser dezgehê.”

Firoşkarên Kurd destnîşan dikin ku dema ew li halê danûstandina berheman dikin wekî muşteriyan tevdigerin û zerzewat û fêkiyên baş dikirin.

**“Em fêkiyên baş û teze difiroşin”**

Niha piraniya zerzewat û fêkiyan biha ne! Firoşkar dibêjin gelek sedemên vê hene. Îsal ji ber ku zivistaneke sar hebû, vê rewşê bandoreke neyînî li ser mexsûlan kir. Ev, yek ji sedeman e. Li van rojan wextekê demkî heye, serevanî diqede û cotkarî dest pê dike, ji ber vê jî gelek berhem stokkirî ne. Firoşkarên Kurd amaje dikin heman demê mesrefên barkirina berheman jî bihayê wan zêde dike û firoşkar dibêjin mîna berê karê wan ne baş e û wiha pê de diçin;

“Berê bo esnafên piçûk piştigirî hebû. Niha li her serê kolanekê market têne vekirin û heman demê reyonên zerzewat û fêkiyan ên marketan hene. Her wisa alternetîfa karta krediyê jî heye. Ev tişt tev de li ser karên me bandoreke neyînî dike.”

Firoşkar vê yekê jî didin zanîn; tevî ewqas marketan, dîsa jî berhemên herî teze û baş di destê wan de ne.

**“Em heqê xwe baş nagirin”**

Firoşkarê Kurd li bazarên Enqereyê ji bo ku cih bi dest bixin pêşî serî li saziyên têkildar didin, piştî ku baca xwe dan, bi riya pişkê (Qura kişandin) li bazaran cih bi dest dixin. Firoşkar bi taybetî balê dikişînin  ser dayîna bacê û dibêjin di her qonaxa karê xwe de gelek bacê didin û her wisa ji şeş mehan carekê heqê cihê xwe yê li bazarê jî didin. Firoşkar li Enqereyê ji heftê pênc an jî şeş rojan di bazarên cûda de dezgehên xwe heman şiklî ava dikin û radikin.

Firoşkarên Kurd gazincên xwe dikin; tevî ewqas ked û fedakariya madî û manevî heqê xwe baş nagirin.

## “BERHEMÊN KU LI ENQEREYÊ ÇÊDIBIN JÎ TÊN DERFIROTIN”

Firoşkarên Kurd rave dikin ku bi taybetî ji herêmên Behra Spî û Egeyê zerzewat û fêkî têne Enqereyê. Dîsa firoşkar diyar dikin li Enqereyê gelek tişt digihêjin wekî îsot, firengî, xiyar, gizêr, zebeş, gêlaz, fasûlî, kundir û hêşinayên din...

Firoşkarên Kurd aşkere dikin ku li havînan Enqereyê ji ber ku zerzewat û fêkî gelek zêde digîhêje, heman demê hilberîna van jî tê kirin. Her wisa ji derveyî welêt jî hawirdeya zerzewat û fêkî tê kirin. Li van rojan ji Şîliyê sêvên kesk, ji Efrîqaya Başûr tirî, ji Îranê zebeş û ji welatên din jî fêkiyên mîna avokado, mango, ananas û gindor tên.



---



FIRAT CEWERÎ

## Edebiyata modern û ferdiyet

Herçiqas bi nêrîn û perspektîfên cihê tarîfa edebiyata modern were kirin jî, bi ya min edebiyata modern ew edebiyat e ku di qaliban de hilnayê, bi dîwarê azadiya fikrê ve radipelike, ferdiyetê navend digire, qeyd û merbendên dîlîtiyê dişikîne; xwe nake hêsîra teolojî û îdeolojiyan, bi fermana desthilatdarî û dîktatoran tevnagere, sînoran gav dike û cihekî xwe di dilên xwendevanan de çêdike.

Yek ji nîşanên bingehîn ên edebiyata modern bêguman roman e. Herçiqas dîroka helbestê bi hezarsalan be jî, lê roman wek şaxekî edebiyatê di dema bajarvaniyê de derketiye û temenê wê bi tenê sêsed-çarsed sal in; bi xurtî jî dused salên dawî ne. Mîna hemû şaxên edebiyatê, hunera romanê jî li ser bingehê zimên tê avakirin. Lê hin ziman dewlemend bin jî, ji ber hin sebeban bi pêş neketine, ji gotin û formulasiyonên ku bi jiyana bajarvaniyê ve li zimên zêde bûne, bêpar mane. Zimanê Kurdî jî zimanekî welê ye. Rast e, ji ber sebebên diyar zêde bi pêş neketiye, lê bingehekî zimanê Kurdî ê qewîn heye. Gelek destanên Kurdî ku bi pesin û wesfên karakteran di rengê romanê de ne, pir dewlemend in. Memê Alan, Siyabendê Silîvî, Ker û Kulik û bi dehan destanên Kurdî bi hunereke welê hatine pê ku mirov ji ziman û taswîra wan ecêbmayî dimîne. Digel vê, dîsa tradisyoneke edebiyata me ya klasîk ya sedsalane heye ku bi tasawif û evîn û taswîrên xwezayê ve xemilandiye. Em dibînin ku hem edebiyata me ya devkî, hem jî ya nivîskî mirov navend girtine û li ser mirovan hûr bûne. Yanî ferdiyet xistine navendê, xwe di kolektivîzmê de nefetisandine. Ji xwe romana modern jî, bêtir konsantreyî ferdiyetê ye. Ji ber ku bajarvanî jiyana kolektîv ya ku berhema civata gundîtî an derebegiyê ye, ji hev difeşkilîne, mirov li bajaran, li bajarên mezin ji komê diqete, bi tenê dimîne û dibe ferd. Ew ferdiyet e ku xwe dirêjî naveroka romanan dike û bi destên romannivîsên hoste dibin karakter û ew karakter in ku ji civatê re dibin nimûne.

Herçî civata Kurdî ye, herçiqas êdî ew jî rengekî bajarvaniyê werdigire, dîsa jî xwe bi temamî ji civata feodaliyê, eşîriyê, tarîqatê, partîtiyê û komê rizgar nekiriye; ferdiyet neaniye pê. Loma, di civata me de ferd nikarin bi ferdîtî tevbigerin; an jî gava bi ferdîtî tevdigerin, kirasekî din li wan tê kirin; ew li ku xuya bikin, bi wî cihî ve tên girêdan.

Gava romannivîsên me di romanên xwe de bi dû nêçîra kesan, kesên reben dikevin û wan ji quncikên wan ên xalî derdixin, rewşa wan eşkere dikin û balê dikişînin ser wan, ew hingî dikarin tûşî rexneyan jî bibin. Dikare ji wan re bê gotin ku çima ew bi taybetî li dû mirovên welê digerin û li ser qehremaniya heyî nanivîsîn. Ji bo romannivîsekî modern qehremanên herî resen ev mirov in, ên mayinde jî her ev in. Ji ber ku mirovek xwe di jiyana hezarî de nabîne, lê hezar dikarin xwe di jiyana yek mirovî de bibînin. Dibe ku jiyana hezarî wek nûçeyekê li ber çavên mirov bikeve û derbas bibe, lê mirov li jiyana kesekî radiweste, pê re digirî, pê re dikene. Kêf be mirov kêfê dijî, hizin be mirov dikeve kûraniya xemgîniyê. Bi gotineke din empatiya jiyana hezarî ji ya yekî/yekê zehmettir e. An jî mirov nikare empatiyê bi jiyana hezarî re bike, lê empatiya bi jiyan û rewşa kesekî, an kesekê hêsantir e.

Ji xwe avakirin û afirandina bi giştî hunerê û bi taybetî jî edebiyatê karê takekesî ye. Ew cîhan û jiyana ku hêdî hêdî di serê afirandinêr de dikemile, bi laş û gewde dibe û xwe dide der, tavilê dikare têkeve jiyana me û ji me re bibe nimûne. Hin nivîskar hene ku xwe dixin qalibên pêxemberan û bawer dikin ku dengek di guhên wan de dike pistînî û ew jî radixin ser kaxezê. Di eslê xwe de prosesa afirandina berhemekê hinekî weha ye. Herçiqas ji îlhamê bêtir disiplîneke xurt jê re lazim be jî, ew hinekî jî bi îlhamê ve girêdayî ye; îlhama takekesî ku bi disiplîn tê hûnan û digihîje me.

Gava ez behsa takekes dikim û bi edebiyata modern ve girê didim, ez nabêjim ku romanên li ser bûyerên komî tên û hatine nivîsandin ne romanên modern in. Bo nimûne heke romanek li ser berxwedan, serîhildan an jî şerê Kurdan were nivîsandin û bi tenê behsa girseyê bike û ferdiyetê navend negire, ew belkî ji aliyê dîrokî ve wek belgenameyekê bimîne. Lê romanek ku ji nav wê zilma nedîtî behsa zarokekî, behsa jinekê, behsa evîna jin û mêrekî, an jî behsa rizgariya kesekî ji wê zilmê bête kirin, hingî xwe bêtir xwe dirêjî dilê xwendevên dike.

Bi kurtî, hem afirandina berhemeke edebî karê takekesî ye, hem jî xwendina wê…

# Kerkûk, referandom û meşrûiyet



Dîrok bi caran bûye şahid ku li himberî destkeftiyên miletê Kurd helwesta Tirk, Faris û Erebên Iraq û Sûriyeyê ji hev nedûr in. Pirê caran helwesta wan yek e. Dikarin hemû nakokî û arîşeyên nav xwe bi carekê re deynin aliyekî û li himberî mafên rewa yên miletê Kurd bibin yek. Vê carê jî nehiştin ku em li helwesta wan biheyirin.



ŞEFÎQ PÊŞENG

Di demek mîna weke Kurd di xewa mirinê de bin, 'Serdarê ji Barzan', Mela Mistefa Barzanî ji Sovyetê dizîvirî û vejîna miletê Kurd, tekoşîna ji bo mafên netewî û demokratîk careke dî dest pê dikir. Kurd di vê tekoşînê de ketin, lê dîsa rabûn ser piya. Rastî tevkujiyan, Enfalan hatin, lê serî netewandin. Fedekarî, dilsozî û lehengiya li qada şer nîşanên biryardariya xwedî lê derketina xaka welêt bûn, lê bi tena xwe ji bo têkbirina dijmin têr nedikirin. Ji xwe ji mêj de di navbera hêzên dagirker û hêzên niştimanpwer de ferqeke mezin çêbûbû. Ferq wisa mezin bûbûn ku herçi bê dînamîkên hundir pirs çareser nebin jî, di pirsên netewî de rola dînamîkên derva her diçe ji yên hundir zêdetir be.

**Derfeta dîrokî**

Çavsorî û çavlideriya rejîma Seddam deriyekî nû ji miletê Kurd re vekir. Piştî Şerê I.yê Xelîcê bi piştevaniya DYAyê gelek deverên Kurdîstana Başûr ji rejîma Seddam hatin rizgarkirin û rewşeke de facto çêbû. Kurdistana Başûr ji aliyê Kurdan ve dihate birêvebirin, lê statûyeke fermî bêpar bû. Aboriyeke millî tune bû. Lê dîsa jî di salên heta Şerê II. yê Xelîcê, Kurdan birînên xwe derman kirin, bêhna xwe vedan.

Kurd li Başûrê Kurdistanê piştî hilweşandina rejîma Seddam û bi qanûna bingehîn ya 2005an dibûn xwediyê statûyeke fermî ya him ji aliyê dewleta Iraqê û him ji aliyê sazî û dezgehên navneteweyan naskirî. Pirsgirêkeke heyatî neçareserkirî mabû. Di serî de Kerkûk, Xaneqîn, Deşta Nînovayê, Şingal û hin navçeyên dinê yên Kurdistanê li derveyî serweriya Herêma Kurdistanê mabûn. Kurd û Ereban ji bo çareseriya vê arîşeyê li ser xala 140-î lihevkiribûn. Xala 140-î xaleke demkî bû, lê ji sebeb helwest û rêgiriya hukumetên Bexdayê bûbû xaleke daîmî. Hukumetên Bexdayê rê nedidan ku ev arîşe çewa di xala 140-î de hatiye destnîşankirin, bê çareserkirin.

Biderengxistina bicîhanîna xala 140-î yek arîşeya sereke ya navbera Hewlêr û Bexdayê bû. Şerê DAÎŞê arîşeyên nû lê zêde kirin: Bi taybet di dema serokwezîriya Nurî El Malîkî de pêwendiyên Hewlêr û Bexdayê hema hema qut bûn.

Kurd ji 1992an ve de facto û ji 2005an vir de jî fermî û bi meşrûiyeteke ji aliyê dinyayê ve naskirî, serwerê welatê xwe ne. Helbet em dikarin minaqeşe û rexne bikin, bê di vê dema ku ne kurt e, çi hat kirin çi diviya bihatanan kirin û lê nehatin kirin. Lê êdî ev yek ji çi derdekî me re nabe derman.

Şerê DAÎŞê li gel êş û azarên mezin û tarjediya Şingalê ku bêguman trajediyeke herî mezin e hatiye serê Kurdên Êzdî, refleks û dînamîzmên miletê Kurd bihêzkirin. Derfetên nû derxsitin pêşiya Kurdan. Him li Başûr û him li Rojava rêyên tifaqa bi hêzên navneteweyan û bi taybet bi DYAyê re vebûn. Xwebixwe baweriya miletê Kurd jî, bi Kurdan bawerî jî bihêz bû. Têkiliyên Herêma Kurdistanê û gelek welatan berfireh bûn. Di rayagiştî ya dinyayê de qenaeta li Kurdan neheqiyeke dîrokî hatiye kirin û Kurd di herêma xwe de ji hemû neteweyên dinê nêzîktirî normên mirovahî û demokratîk in, xurt bû. Pêwistî û mafê dewleteke Kurd di vê demê de bêtir kete rojeva medyaya cîhanê. Ev hizr çiqas diçe zêdetir tê minaqeşekirin û maqûltir tê dîtin.

Şerê DAÎŞê pirseke dinê jî derxist holê, ew jî pirsa ewlehîyê bû û ev pirs heyatî bû. Diviya Kurd li rê û rêbazên jiyaneke ewle û heta bi heta bigeriyana û di dawiya vê lêgerînê de hizra serxwebûn û dewletbûnê derketibû. Di van çend salên dawî de, di serî de serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û PDK-ê di her derfetê û li her platformê behsa pêwîstî û mafê serxwebûnê kiribûn û ji bo vê armancê dîplomasiyeke çalak meşandibûn.

Lê Barzanî û PDK bi tenê bûn û ev mesele ew çendî mezin bû ku ew bi serê xwe nikaribûn di ber rabin. Axirê tiştê diviya belkî du sê sal berê bibûna bû û serokê herêmê Barzanî, her du hêzên sereke yên şoreşa Başûr anîn gel ev e. Yekem gav û encama tifaqê ku bêşik stratejîk e, li Kerkûkê û li hemû dezgehên fermî bilindkirna Ala Kurddistanê bû. Di 28 ê Adarê de li Kerkûkê bilindkirina Alaya Kurdistanê, bicîhanîna wesiyeta Pêşewa Qazî Mihemed, şakirina rihê Mistefa Barzanî û diyardeya ji nû ve gihaştina dayik û zaroka bi zorê jihevveqetandî bû.

Rêya rast hatibû dîtin. Hêzên sereke û dîrokî li ser referandoma dê siberoja Kurdistana Başûr û heta dereceyekê hemû miletê Kurd taîn bike, li hev kiribûn û niyet kirûbûn hemû hêzên Başûr bikin hevparê vê pêvajoyê. Di du rojên dumahîkê de Meclîsa bajêr ya Kerkûkê ji bo destnîşankirina çarenûsa Kerkûkê û girêdana wê ya Herêma Kurdistanê, biryara referandomê wergirt.

**Kerkûk, Al, helwesta Enqera, Tehran û Bexdayê**

Dîrok bi caran bûye şahid ku li himberî destkeftiyên miletê Kurd helwesta Tirk, Faris û Erebên Iraq û Sûriyeyê ji hev nedûr in. Pirê caran helwesta wan yek e. Dikarin hemû nakokî û arîşeyên nav xwe bi carekê re deynin aliyekî û li himberî mafên rewa yên miletê Kurd bibin yek. Vê carê jî nehiştin ku em li helwesta wan biheyirin.

Parlamentoya Iraqê di pirsa hildana Ala Kurdistanê li Kerkûkê, bi daxuyaniyekê nerazîbûn û dilgiraniya xwe ragihand. Di rastiyê de ev ala li Kerkûkê hatibû hildan, ji 2003yan vir ve li Kerkûkê hildayî bû lê vê carê bi biryara meclîsa bajêr di meclîsê û avahiyên fermî de hatibû hildan. Îranê nerazîbûna xwe di dereceyeke nizm de diyar kir. Berdevkê wezareta karê derva yê Îranê Behram Qasimî, di daxuyaniya xwe ya bi islûbeke dîplomatîk, alhildan weke çalakiyeke li dijî qanûna bingehîn ya Iraqê nirxandibû.

Helwesta Tirkiyeyê ji ya Iraq û Îranê jî tundtir bû. Serokweîzrê tirk Binali Yildirim, wezareta karê derva û axirê serokkomar Recep Tayip Erdogan derheqê rûdana nû de daxuyaniyên cihê cihê dan. Daxuyaniyên serokwezîr Yildirim û wezareta karê derva heta dereceyekê bi islûbên dîplomatîk bûn. Li gorî wan; Li Kerkûkê grûbên cuda yên etnîkî dijîjn, loma hildana ala neteweyekî ne rast û ne li gorî qanûna bingehîn ya Iraqê bû. Islûba serokkomarê tirk ji islûbeke dîplomatîk wêdetir, gefxwir û fermanber bû. Erdogan daxwaza daxistina alê dikir û digot: 'Wê alê daxin xwarê, an na hûn dê ji vê cîhê hûn lê ne paş ve bizîvirin!'

Ne hewceyî gotinê û heqîqetek e ku li Kerkûkê ji bilî Kurdan Turkmen û Ereb jî dijîn. Lê heqîqeteke dinê jî heye ku ew jî Kurdistanîbûna Kerkûkê ye. Çewa li Stenbolê sed qat li nifûsa Turkmenên Kerkûkê Kurd, milyoneke dinê netirk dijîn, lê Stenbol bajarekî Tirkiyeyê ye, çewa li Bexdayê bi milyonan ne Ereb dijîn, lê Bexda bajarekî Iraqê ye, wisa jî Kerkûk bajarekî Kurdistanê ye.

Tirk, her cara ku Kurd nêzîkî mafên xwe yên netewî û demokratîk dibin, Turkmenan bibîra xwe tînin. Turkmen jî ne weke Kurdan û Şîeyan be jî di bin zilma rejîma B'esê de naliyan. DAÎŞê jiber mezhebê wan êrîşî wan kir, talana wan bir, keç û jinên wan revandin. Kes nebû şahid ku hîç dengek ji Tirkiyeyê derket. Ji bilî grûbeke biçûk Turkmenên 'mamûrên' Tirkiyeyê, Turkmen jî êdî dizanin ku ew ne xema Tirkiyeyê ne.

Helwest û daxuyaniyên Îran û Tirkiyeyê, helbet bêbersîv neman û him serokê Herêma Kurdsitanê Barzanî û him jî hemû berpirsên hêzên Kurdistana Başûr bi biryardarî li pişt biryara Meclîsa Kerkûkê sekinînin.

**Biryarên referandoman biryarên dîrokî ne**

Bêguman ne hewce ye bê gotin ku divê Kurd gefên Tirkan û rêgiriyên Ereb û Farisan yê mihtemel paşgoh nekin. Rol û hisabên nû yên Îranê li herêmê û Iraqê çi ne? Enerjiya xirabker ya Îranê li Kurdistanê çiqas e? Tirk heta ku dikarin herin? Hêz û taqeta Iraqê çi ye? Meriv dixwaze bawer û hêvî bike ku birêveberiya Kurd di pêwendiyên bi Faris, Ereb û Tirkan re têra xwe xwedî azmûn e.

Lê divê bê gotin ku gelek arîşeyên navxwe jî li benda çareseriyê ne. Parlamento wê çewa bibe karîger? Hukumet wê çewa bibe serweriyeke çalak û dînamîk ? Ku ev her du arîşe çareser nebin, wê temsîliyeteke meşrû û bêîtîraz çewa derê? Ne dûrî aqila ye ku motîvasyon û maneviyeta ji hamleya Kerkûkê û biryara referandom serxwebûnê derketiye, bikaribe rê li ber çareseriyên van arîşeyan jî veke. Û helbet di van mijaran de jî berpirsê sereke serokê herêmê bi xwe û -çendî hebe - hukumeta herêmê ye.

Qenaeta hevbeş ev e ku di meşa serxwebûnê de biryara referandomê pêngava herî stratejîk e. Dê ji bo miletê Kurd li gel rewabûna mafê serxwebûnê, meşrûiyeta herî mezin îradeya miletê Kurd be û ew jî dê bi referandomê derê holê. Loma jî referandomeke bi silametî, bi beşdariyeke zêde û erêkirineke eşkere wê gelek îtirazên li dij serxwebûnê pûç bike.

Heta referandoman gelek kar û şuxil li benda birêveberiya Başûr, birêveberiya Kerkûkê û her Kurdekî ne. Zelal e ku tercîha birêveberiya Kurd rêyeke aşitiyane ye. Kurdistana Başûr qelenê azadiyê ji mêj de û çend caran daye û ji niha pê ve her dilop xwîna Kurd, wê zêde be. Loma jî ceribandina rêyên aşitiyane girîng e.

Komîta Hevbeş li aliyekî hevdîtinan bi hêzên Kurd re, li aliyê dinê jî bi hukumeta Bexdayê û hêzên şî`e re dimeşîne. Bêguman ev hewldanên heja ne. Divê armanca hevdîtinên navxwe ji piştgiriya hêzên Kurd yên dervayî PDK û YNK-ê bêtir bo hemû hêzên Kurdistanî vekirina deriyê hevparî û xwe xwediyê dozê dîtinê, be.

Di vê navê de û tam jî di demeke Komîteya Hevbeş li li Bexdayê hevdîtinên derbarê referandomê de pêk dianî, şandeyeke payebilind ya amerîkî hat Hewlêrê. Beşdarîya şêwirmendê serokê DYAyê Jared Kushnerî vê hevdîtinê girîng dike.

Dixuye ku weke otonomiya salên 1970yî, wê qiyamet dîsa li ser Kerkûkê rabe. Referandoma Kerkûkê li gorî xala 140î û li gorî destûra bingehîn ya Iraqê ye. Divê Kurd vê rastiyê bi dinyayê bidin fêmkirin.

Bêguman rîsk hene, ewên dê bixwazin rê li ber referandoman bigrin ne kêm in. Lê çare jî hene. Pêşîlêgirtin û pûçkirina destdirêjiyên ji derva, bi tifaqeke berfireh, refleks, disîplîn û îradeyeke hevbeş mimkin e.



Kurd li Başûrê Kurdistanê piştî hilweşandina rejîma Seddam û bi qanûna bingehîn ya 2005an dibûn xwediyê statûyeke fermî ya him ji aliyê dewleta Iraqê û him ji aliyê sazî û dezgehên navneteweyan naskirî. Pirsgirêkeke heyatî neçareserkirî mabû. Di serî de Kerkûk, Xaneqîn, Deşta Nînovayê, Şingal û hin navçeyên dinê yên Kurdistanê li derveyî serweriya Herêma Kurdistanê mabûn. Kurd û Ereban ji bo çareseriya vê arîşeyê li ser xala 140-î lihevkiribûn. Xala 140-î xaleke demkî bû, lê ji sebeb helwest û rêgiriya hukumetên Bexdayê bûbû xaleke daîmî. Hukumetên Bexdayê rê nedidan ku ev arîşe çewa di xala 140-î de hatiye destnîşankirin, bê çareserkirin.



# Dermankirina birînên penabera bingeha Dezgeha Barzanî ye



DARAYÊ PORXELEK

RÊXISTANA ku binavê Komeleya Aşitî a Zeytûnî a Sûrî (Suriye Barış Zeytini Derneği) li Stenbolê hatiye ava kirin, ji ber alîkariya bo hewcedar û mexdûrên şerî li Suriyê xelatek da Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî.

Xelat ji bo harîkariyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî kul i awareyên Sûrî ku aware bûne Herêma Kurdisyanê. Dezgeha Xêrxwazî a Barzanî ya ku berî niha ji ber alîkariyên ji bo derveyî sînorên Kurdistanê hatine kirin ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve jî hatiye xelat kirin. Bi taybetî li Kurdistanê û bi giştî li cîhanê ji bo piştevaniya hemû mirovên hewceyî harikayê ne ye.

Endamê Rêveberî û Serperejtê Karkirina Projeya Yetîma yê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Herêma Kurdistanê Wahid Ertûşî diyar dike ku; ew plankirina belavkirina harikariyan bêciyawaziya nasname û neteweyan pêk tînin û dibêje, “Pêşaniya me harikariya hewcedarên kesên ku ji ber şerên li erdnigariya me rû didin û belavkirina hewceyiyên herî pêwîst e. Bi şêweyekî din ve erkê me rizgarkirina giyanê mirovan e û wek alîkariya pêşîn e ji bo birîndarên bûyerê. Dermankirina birînên wan bingeha hebûna me ya herî girîng e.”

**Pêwendiyên Me Bi Rêxistinên Alîkariyê Ve Berdewam in**

Wahîd Ertoşî wiha got; Pêwendiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî bi saziyên xêrxwaziyê yên navneteweyî ve, bi saziyên civakî yên medenî ve û bi taybetî jî bi beşa Alîkariya Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî ve hene. Lê rasterast piştgiriyê ji tu saziyan wernagire. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî, bi taybetî xurekên sereke, cil û berg, betenî, germker, mama bo zarokan, pateyê zarokan û tiştên herî pêwîst bo jiyanê dişîne kampan. Dezgeh ku ji destê wê tê ji bo perwerdehiya zarokan, mexdûrên şer, kesên bûye penaber alîkarî û amûrên perwerdehiyê dide.

Ji Bo Kobanî 12 Tir Alîkariya Pêwîstî

Gava DAIŞê sala 2014an êrîş bire li ser Kobanî, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî 12 tirên kelûpên alîkariyê yên herî pêwîst şandibûn Kobanî. Di nav wan tiran de 126 pakêtê alîkariyê hebûn. Têra nêzîkî 6 hezar kesan savar, birinc, fasûlî, xurekên sereke û betanî hatibûn belav kirin.
Ji bilî vê 6 tirên alîkariyê jî ji bo kesên derbasbûyî Sirûcê hatibûn şandin. Her wiha ji bo kesên li Bakurê Kurdistanê û li Rojavayê Kurdistanê cil û bergên zivistanê û mama ji bo zarokan hatibûn belav kirin.

**Me bi Helîkopteran alîkarî bir ji bo Şingalê**

Heman salê DAIŞê êrîş biribû li ser Şingalê jî, me alîkarî gihandin wan jî. Her roj xwarina gerim dihate dayîn ji bo kesên ku ji Şingalê dihatin. Xebatkarên Dezgehê ji bo 1200 malbatên li Çiyayê Şingalê 30 tirên alîkariyê gihandibûn wir. Her wiha ne tenê ji bo kesên li Çiyayê Şingalên, ji bo kesên li kampan û Rojavayiyan jî alîkarî hatibû belav kirin.

Pêşiyê Tespît, Paşê Alîkarî

Dezgeh piştî ku bi rêya cîhên pêwendiyan kesên ku hewcedar li kampan, li çadiran û li ba mirovên xwe dijîn peyde dike alikarî jê re dişîne. Dezgeh ji kesên xêrxwaz alîkariyan kom dike. Dezgeh ji tu hikumet û ji tu partiyên siyasî alikariyan wernagir e.

**NY: Em Piştgiriya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî Dikin**

Berpirsê Alîkariya Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî li Îraqê Lîsa Grande, gava serdana kampa Hasan Şam ku bûye stargeh ji bo penaberên ji Musilê revî dike di derheqê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî de ya ku alîkarî şandibû ji bo penaberan gotibû, “Kampa Hasan Şam li Îraqê kampa herî baş e. Çimkî organîzasyona vê kampê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî birêve dibe. Komîseriya Bilind Ya Penaberan NY (UNHCR) jî piştgiriyên xwe li kampê didomîne. Standartên li vir diyar dike ku ya herî baş e. Ev jî ji bo Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî cîhê şanaziyê ye, di warê alîkariya penaberan û belavkirina hewceyiyên wan de pesneke mezin heq dike û xebatên gewre pêk anîn. Em wek Neteweyên Yekbûyî piştgiriya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî dikin.” Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ji aliyê NY ve tê nasîn û alîkariya hemû feqîr, penaber û mexdûrên koça yên li çar perçeyên Kurdistanê dike. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ji bo nêzîkî 2 milyon penaberên li Herêma Kurdistanê, alîkariya mehane ya xwarinê dike. Ji bo 6129 malbatên li Xebata li bajarokê Koyê li Herêma Kurdistanê ji bo mehekê alîkariya xurek hate dayîn. Her wiha Dezgehê, tenê di mehekê de birêya WIFPê ku girêdayî Neteweyên Yekbûyî ye ve ji bo 75.369 malbatên hewceyiyên sereke belav kirin.



**Eger Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî neba wê gelek miriban**

Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî alîkariyê ji bo penaberan didomîne. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ya ku bi saziyên navnetewî re jî xebatan dike û li çar perçeyên Kurdistanê alîkariyan belav dike, alîkariyên xwe di serî de ji bo zarokên penaberan şîr û hewceyiyên sereke didomîne. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî, ji bo zarokên li kampan dimînin hewceyiyên pêwîst yên nû belav dike. Waliyê Erep Hamadî: “Tu welatên Ereban alîkarî nekir. Eger Kurdistan û Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî neba wê gelek miriban.”

Pêşaniya me harikariya hewcedarên kesên ku ji ber şerên li erdnigariya me rû didin û belavkirina hewceyiyên herî pêwîst e. Bi şêweyekî din ve erkê me rizgarkirina giyanê mirovan e û wek alîkariya pêşîn e ji bo birîndarên bûyerê. Dermankirina birînên wan bingeha hebûna me ya herî girîng e.”




Karîkator ---------------------- Dijwar Ibrahim


Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî saziyeke nehikumî û nesiyasî û qazanc nexweste û li sala 2005 li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê hatiye damezrandin û birêz Mesrur Barzanî Serokê Bordê Dezgeha Xêrxwaziya Barzaniye û raste rast serpereştiyarê karên vê saziyê dike.

Dezgeh ji bo destpêkê îş û karên xêrxwaziyê, muhleta karkirinê ji aliyê Hikumeta Iraq û Hikumeta Herêma Kurdistanê li çarçêweya rêxistinên nehikumiyan wergirtiye. Bi sedema berfirehbuna kar û çalakiyan û bi alîkarîkirina koçber û penaberan li sînoran û navxweya Herêma Kurdistanê da wiha kir rêxistinên cîhaniyên navdar jî peywendiyekî bi hêz li gel da bibestin û hevkarî û hemahengiyeke zêdetir li navbera her dû aliyan da dirust bibê. Berev pêşveçûna peywendiyan û bi rêxistîbûna îş û karên dezgehê bûye sedema wê yekê ku li civîna meha 4 ê 2016 ê kargêrî û hemahengiya Neteweyên Yekgirtî, biryar hate dayîn Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî wekî rêxistineke nehikûmî bibê endamê Şêwirmendê Taybet li Encûmena Aborî Civakî (ECOSOC) ya ser bi Neteweyên Yekgirtî.



MIRAZ BABIJ

# Elon Musk û Kurdî



**MILETÊ** ke serê erdê dinya de ciwîyenê, goreyê şert û mercanê tarîxî zaf merheleyan ra ravêrdê. Ma eşîr-dewletan ra tepêşê heta dewletanê împaratorîyan tewir-tewir organîzasyonî ceribneyayê û hema zî dewletê cîhanî zaf sîstem û organîzasyonan ceribnenê. Eke ma bi nê çimîya biewnîyê tarîxê miletanê cîhanî ra, ma eşkenê şoreşê fransîzan sey yew mîlat qebûl bikerê.Badê şoreşê fransizan tayê fikirê cîya-cîyayî mîyanê miletanê cîhanî de bîye vila. Nê fikran ra modernîzm û neteweperwereyî tarîx de zaf çî vurnayî.

Verê modernîzmî hema-hema heme miletanê cihanî de fikrê îlahî/dînî hakîmî bîye labelê badê modernîzmî nê fikrî êdî-êdî vurîyayî û heruna fikranê îlahîyan fikrê sekulerî ameyî qebulkerdiş. Hinî heyatê însanan de termê hemwelatî, neteweperwerî û dewleta milî ca girewtên. Herçiqas tayê dewletî semedo ke hemwelatîyanê xo yewpare tepêşê sey "xaçperestî" yan zî "fikrê omet" bişuxulnê zî, nê dewletanê "neweyan" de fikro bingeyî milî bîyayiş yan zî neteweperwerî bi. Ma nê mewzûyê tarîxî nika veradê û tayê zî qalê sernameyê nuşteyî bikerê.

**Elon Musk kam o?**

28ê Hezîranî serra 1971î de Pretoria ya Afrîkaya Başûrî de maya xo ra beno. Hema 12 serre beno yew kaya komputere virazeno û game erzeno cihanê komputerî. Ma vêşî derg nêkerê... Semedo ke Ordîyê Afrîkaya Başûrî de leşkerîye nêkero koç keno û şino Amerîka. Yew roportajê xo de derheqê na mesela vano: "Problemê mi bi leşkerîya çin o. Labelê wextê mino ke ez bi leşkerîya vindî bikera çin o."

Koçê Amerîka ra dima perwerdeyê lîsansî keno temam û sey Thomas Edison, Nikola Tesla, Bill Gates, Steve Jobs, Walt Disney merdiman xo rê sey çimeyê îlhamî vîne."Problemê ke meşterojê însanan ser o zaf tesîrkaran" ra; înternet, enerjîyo pak û feza xor rê sey wareyê xebatî vîneno. Musk hedefanê xo hema 12 serre beno keno dîyar û nê rayîrê derg û dila de dest bi rayşîyayîşî keno. Nê amancê xo de heta nika xeylê mesafe zî girewto. Sey SpaceX, Tesla Motors û PayPal projeyê zaf rûmetinî virazeno, nika zî wazeno ke "zanyîşan(data) neqlê mezgê însanan bikero.

Ez texmîn kena ke ma Elon Musk tayê nas kerd. Nika ma eşkenê elaqeyê Elon Musk û Kurdan ser o vinderê. Seke yeno zanayîş miletê Kurdan dinya de, miletanê bê dewletan mîyan de şaro tewr vêşî wayîrê nufusî yo. Semedo ke Kurdî bê dewletî yê, nîmetanê dewletbîyayişan ra mehrûm ê. Eke ma yew lîsteya nê nîmetan virazê bêguman nuşteyê ma qîym nêkeno. Labelê ma goreyê şertanê ewroyî bifikirîyê ma vînenê ke nê nîmetan ra tewr muhîmê ci wareyê mîyanneteweyî de wayîrê yew cayî bîyayiş o. Çi heyf o ke Kurdî, na game de zaf dûrê nê ca yê. Labelê Kurdan mîyan de zaf propagandatorê saxlemî este!!! Mavajîme propagandayê kome, komele, partî û fikranê xo zaf saxlem virazenê!!!

Mavajîme qaxuyê dewletanê şarî hend o ke gênê ke wazenê heme dewletê cîhanî bibê ekolojîk û demokratîk!!! Mavajîme qehremananê miletanê bînan rê hend heyranî yê ke, şopa înan dima şinê û heqanê milî yê mileta xo na şope ver o erzenê peynî!!! Mavajîme pîlanê mileta xo sey "reîsê eşîr" vînenê û her tewir heqaret o ke înan rê beno bê şek û bê şubhe qebul kenê. Mavajîme dewleta milî sey fikrêko xam vînenê. Mavajîme dîn yan zî mezhebê xo, yewbîyayişî ver o sey yew manî vînenê!!! Mavajîme hend o ke tembelîyê ke ziwanê înan fekê vindîbîyayişî do labelê no înan rê xem nîyo!!! Mavajîme... Mavajîme... Mavajîme...

Peynîya na lîste çi heyf ke nîno.

Ganî ma se bikerê?

Zanayîş o ke ez zana, wextê sloganane betalan qedîya yo. Wa her kes ziwanê xo, nê sloganan ra pakkero û slogana xo ya peyên warkero. Ewro cîhan de slogana tewr manadar xebitîyayiş o. Ziwanê xo ser o, tarîxê xo ser o, kamîya xo ser o...

Mavajîme eke Elon Musk Kurdan mîyan ra bivejîyayê, gelo wareyê mîyanneteweyî de meşrûîyetê Kurdan ser o tesîrêko senîn virazeyayê? Yan zî xebatanê ey, ekonomîyê Kurdan ser o çi tesîr viraştê?

Bêguman cewabê ke ma nê persan rê bidê, pêro pozîtîf ê. Xortanê ma rê di pêşnîyazê mi estê.

•Qandê xatirê îmanê xo (şima ke çi çî rê îman kenê) nê xortê afro-amerîkayijî xo rê sey nimûne bivînê û bizanê, eke şima bixebitîyê serkewtiş yê şima yo.

•Reyna xatirê îmanê xo na şîîra Ehmedê Xanî xo vîr ra mekerê.

*Ez şaş menda hîkmetê homayî de*
*Kurdî na dewleta dinya de*
*Seba çi wina mendê mehrûm*
*Seba çi pêro bîyê mehkûm*

*Eke ma dir bibîyayên îtîfaqên*
*Eke ma yewbînan rê îteat bikerdên*
*Rom û ereb û eceman bi temamî*
*Ma rê do bikerdên xulamî*

O wext ma temam kerdên dîn û dewlete

Ma o wext tehsîl kerdên îlm û hîkmet

---

# Pers & Cewab:

# Mûrad Kirmancîye

Kam o? Herçiqas Almanya de ameyo dinya zî Mûrad eslê ci de xortêko dêrsimij o. Hem zî dersimijêdo xas o.

Çirê o? Mûrad eqsê şertanê negatîfan nîşto ro û xo bi xo kirmanckî musayo. Bi musayîş nêmendo nika wendox û nuştoxêko aktîf o. Hîna zaf sehaya înternetî de aseno. Bi kilmîye ey ruhê xo çarnayo Kirmancîye ser.

**P: Ti kam î, eşkenî xo bi kilmîye bide şinasnayîş?**

C: Nameyê mi Mûrad o, ez vîst û yew serreyî ya û Almanya de maya xo ra bîya. Ma û pîyê mi dêrsimij ê. Dewa pîyê mi boverê Duzgin Bawayî der a, nameyê dewa maya mi kî Pilvank a .

Ez nika Köln de meslegê xo kena, wexto ke qedîya ez bena tucarê lojistîkî. Dima ez şîkîna biguriye yan kî şêrî Unîversîte.

**P: Eleqeyê to bi kirmanckî senî dest pêkerd û hetanî nika ti çi tewir fealîyetan mîyan de bîyî?**

C: Ez xo zana nêzana keyeyê ma de pê ziwano ke xebera hevalanê minê alman-an ci ra çin biye ameyêne qisey kerdêne. Ci ra "zonê ma" vatênê, la o wext qet bala mi nêantêne, mi rê sey ziwanê dewe ke teyna merdimanê pîlan -yanî maya bi pîye mi ra- zanayêne ameyêne, yanî mi o wext ziwan qij dîyêne. La serran dima ez şîya ser ke azo newe wayîrê ziwanê xo nîyo û ziwanê ma cila merdene de ha yo naleno. Ez ê wextan des û çar yan kî des û panc serreyî bîya. Wexto ke mekteb de tayê wendekaranê tirkî mi ra etnîsîyêna xo persêne, mi kî sey pîlanê xo vatênê ez Kurd a, înan kî desinde gamêk peyser eştêne. Mi kî sebebê ci meraq kerd, mi cigêrayîşî kerdî, dima bîya wayîrê fikrê sîyasî – xora rew bo herey bo, Kurdê Ewropa kî kewenê sîyaset, meseleyê welatî kotî de benê wa bibê, yenê zeleqînê to ra. Mesela ez teyna hîrê-çar rey pê teyara şîya Dêrsim, merdimo ke ney bihesno vano :"eleqayê to bi welatî çin o" la hende asan nîyo.

Ez bêşik şîkîna nê vajî ke her dêrsimijo ke Ewropa de weşîya xo rameno, beno ke heqî ra yo, tewrê welatê xo yo. No tim nîya bî. Domananê xalanê mi ra heta hevalanê minê dêrsimijan, pêro bi sereberzîye dêrsimijîyêna xo goynenê. La teyna goynayene mi rê bes nêbîye, mi va eke ez teber de tim vana ke kirmanc a, o wext ez do kirmancîyêna xo bizanî û na kî bê ziwan nêbena. Mi bi no qayde dest bi musayîşê ziwanî kerd. Xora mi ziwanê ma weş fam kerdêne, la herçiqas ke mi cerebna, ez nêeşkîya çip qisey bikerî, no kî şî zorê mi. Mi bi dest bi wendena xeberanê ke bi ziwanê ma nusîyayê kerd. Nuşteyanê kovara Vateyî ra hetanî yê DêrsimInfoyî mi pêro wendêne. Ez raştê hevalanê zaf ercîyayeyan bîya, wexto ke ziwanê mi avêr şî, mi seba DêrsimInfoyî tayê nuşteyê kilmî nuştî. Rîpelê Wîkîpedî ra heta pelanê Facebookî, mi zaf cayan de herçiqas kilm bo kî seba averberdena ziwanê xo nuşt.

**P: Ti ewro rewşa lehçeya ma senî vîneneni? Goreyê to çîyê başî û negatîfî çi yê?**

C: Mi gore ewro rewşa kirmanckî ne zaf rind a ne kî zaf xirab a. Yanî ameyoxê ci hona ma dest der o, bitaybetî destê mayan û pîyan der o. Seke nameyê ci vano "ziwanê dayîke " cor ra nêno war, merdim do pîlanê xo ra bimuso, do her wext keyeyî de bêro qisey kerdene û teberê keyeyî de kî bêro şuxulnayîş. Eke ez qayîtê dormeyê xo bena vînena ke cêncî giran-giran bo kî êdî qîymetê Kurdkî fam kenê, rêxistinê musayîşê Kurdkî benê ra, tayê unîversîteyan de Kurdkî xo kom kenê û pîya Kurdkî (çi kirmanckî çi kurmanckî ) musenê û musnenê. No mi çim de çîyêdo muhîm o, gerek merdim qijan de dest pêbikero, înan qezenc bikero. Ez zaf nêwazena ke çîyanê negatîfan ser o vinderî, çimkî destê ma girêdaye yê, merdim zaf nêşîkîno xo bido ê hetî yan kî nê hetî ser, çimkî sîstemo ke ma tede ciwîyenîme hetkarîya ma nêkeno, ma asteng keno.

**P: Goreyê to ganî hema xebatê senînî bêrê kerdene?**


C: Ziwanê ma de kitabê romanî, sanikan ûsn. vejîyê, la hende ke ez zanena kitabê domanan çin o yan kî hende senik ê ke ez înan nêzanena. Seke mi cor ra nuşt ma do domanan qezenc bikerîme, coka ez vana na babete de ma hona apey îme. Ez reyna vana nê wextî de, wextê Înternetî de, ma çayê xo nêdanîme ci? Ma çira vîdeoyanê ke merdimî rê zazakî musnenê nêancenîme û înan youtube de nêweşanenîme? Merdim çîyo ke rameno peynîya roje de çîneno, gerek ma nê portalan ser o fikranê xo vila bikerîme, çike ê portalan ser o merdim hîna asan reseno mezgê domanan.

**P: Çarçewaya xebata ziwan û kulturê ma de planê to estê? Eke estê çi yê? Xeyalê to çi yo?**

C: Gerek merdim raşt qisey bikero; no ziwan, ziwanêdo çetin o , asan nîno musayene. La her ke ez pê qefelîna, bêzar bena , xeyalê xo ana xo vîrî. Xeyalê mi o yo ke roje ez bi domananê xo ra yewmînî de teyna bi kirmanckî qisey bikerîme. La heta a roje ez do hona zaf bigurîyî, zaf biwanî. Planê mino sabît çin o, ez wazena ke wayîrê ziwanêdo pêt bibî, seba naye ez do hem qisey bikerî hem kî binusnî. Hevalê mino ercîyaye Mahîr Dogan kî pîşta xo saneno mi, ez sayeyê ey de şîkîna DersimInfo de nuşteyan binusnî. Xora eke xeylê wextî nênusî ez rew xo de vezen ke ziwanê mi beno giran, peyser şono. La eke timûtim aktîv binusnî, nuştena mi kî bena zelale. Kam zaneno, belkî a roje kitabê mi kî vejîno.



---




## Kedkarêkê cuwenê kirmanckî:

# Nuștox û șaîr J. Îhsan Espar




MUTLU CAN










**ROJHELATÎ** de edetêko kehen estbî; seba ke kerm û kezan zerar nêdê kitaban, rîpelê yewinî yê înan ra "ya kebîkeç" nusîyayêne. Helbet no bilasebeb nêameyêne kerdene. Goreyê mîtolojîye rojhelatî kebîkeç nameyê meleke yan zî cin o/a kitaban paweno/a yo. Ez vana qey tersêkê winasî bawkalanê ma nêgirewto çunke feqîr û rebenî ne eşkayê bi xo kitaban binusê ne zî bibê wayîrê zaf kitaban. Dişmenê ma, bi hezaran kerm û kez û maran ra beterêr bîyê. Neke tena ziwanê ma de nusîyayîşê kitaban rê hetanî vizêrî nameyê ma rê bîle tehamul nêkerdêne. Naye ra û heyf ke mewlîdanê Mela Ehmedê Xasî û Usman Efendîyê Babijî ra teber mîraso ke ma rê mendo çin bî. Dişmenan, ziwanê ma kerdo lal û ma bêhêvî verdayo. Nika winî nîyo. Axir ziwanê ma resayo yew derece û ma zaf rehet eşkenê behsê edebîyatê ma bikê. La seke şima zî zanê tu çî xo bi xo nêbeno. Eke kirmanckî şewa zulmate ya vizêrî ra resaya roşnaya ewroyî naye de rolê xoverdayîşê çend şexsîyatan o ke mabênê serranê 1970 û 1980an de ciwanîya xo vîyarnaya pîl o. Înan semedê ziwan û kulturê ma kedêka pîlê werda. Bingeyê edebîyatê ma bi sayeyê gamanê înan ronîyayo. Yewê înan, mêmanê rîpelê ma yo; J. Îhsan Espar. Bêrîn ma ey hîna nêzdî ra nas bikîme.

**Bîyografîya ey**

Îhsan Espar, 1956 de Pîran de maya xo ra bîyo. Ey 1979 de, Dîyarbekir de Enstîtuyê Perwerdeyî qedênayo. Demeyêko kilm mamostetîye kerda. 1983 de şîyo Swêd û nika zî uca maneno. Îhsan Esparî Unîversîteya Stockholmî de tarîx û averşîyayîşê ziwanê ciwananê diziwanîyan û yê Gävle de zî îlmê cematkî wendî.



O, destpêkî ra redaksîyonê kovara Vateyî de yo û hûmara 44. ra pey serredaktorîya na kovare keno. Serra 2001 ra zî redaksîyonê kitabanê gedeyan yê Weşanxaneyê Apecî de ca gêno.

**Kitabê ey:**

1) Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, çapa yewine Berlîn, 1995, çapa dîyine Îstanbul, 2004
2) Beyi Se Bena? Îstanbul, 2004
3) Dilopê Zerrî, Îstanbul, 2008
4) Sanikêka Heskerdişî, Îstanbul, 2014
5) Nivîsên Xwendekaran -ji dersên Kurdî- Stockholm, 2017

**Kitabê ke ey nuștoxanê bînan reyde amade kerdî:**

1) Beşîkçî, Îsmaîl, Çend Gotin Li Ser Ronakbîrên Kurd, Weşanên Rewşan, Bonn, 1992 (Wergera ji tirkî bo kurmanckî, J. Îhsan Espar& Amed Tîgrîs)
2) Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Tirkî -Kirmanckî (Zazakî) Îstanbul, 2009
3) Grûba Xebate ya Vateyî, Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî), Îstanbul, 2005
4) Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Îstanbul, 2016

**Kitabê ke ey swêdkî ra çarnayî kurmanckî û kirmanckî ser:**

1. Nordqvist, Sven, Dema Findo biçûk bû û winda bû, Weşanxaneya Apecê, Stockholm, 2001 (Swêdkî ra kurmanckî)
2. Nordqvist, Sven, Xuşka min li ku ye? Weşanxaneya Apecê Stockholm, 2008 (Swêdkî ra kurmanckî)
3. Defoe, Daniel, Robinson Crusoe, Weşanayox: Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Îstanbul, 2005 "Swêdkî ra kirmanckî (zazakî)"
4. Hugo, Victor, Notre – Damea Parîsî, Weşanayox: Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Îstanbul, 2005 "Swêdkî ra kirmanckî (zazakî)"

Nê kitabanê corênan ra teber ey pancês kitabê gedeyan zî swêdkî ra çarnayî kirmanckî ser.

**Fekê ey ra**

Şeymus Dîkenî semedê kitabê xo "Amidalılar Sürgündeki Diyarbekirliler" 21 şexsîyetê ke sedemanê polîtîkan ver şîyê Ewropa û bi serran surgun mendê, înan reyde roportajî kerdê. Nê kesan ra yew zî Espar o. Mi, nê kitabî ra çend vatişê ey çarnayî kirmanckî ser.

*"Ez 1956 de qezaya Pîranî ya Dîyarbekir de maya xo ra bîya. Pîran domanîya mi de qezayêka nufusê xo 3-4 hezarî bî. Ê wextan çarşîyê Pîranî 30-40 dikanan ra îbaret bî. Qeza de hezar banî ke hemeyê înan kerra û welan ra virazîyaybî estbîy. Serrê ke mi dest bi dibistane kerdbî, ê serran Pîran de elektrîk çin bî. Sewbîna tesîsanê binawanî ra awe, kanalizasyon ûsn. çin bîy..."*

Baş o. La ma zanê ke îmkanî çiqas kêmî bê zî her domanîye de çîyê ke domanî ci ra keyf bigîrê estê. Yê domanîya mamosta Esparî zî radyo bîyo:

*"Çîyo ke reng dayêne cuya ma ya rojaneye radyo bî. Yeno mi vîr, keyeyê ma de yew radyoyo ke qasê sindoqa cêzî gird bî û bi pîlanê anot-katotan xebitîyayêne estbî. Semedo ke zaf parazît kerdêne ma ci ra eciz bîy. La ey rê wayîrbîyayîş îmtîyazêk bî û ma naye ra keyf girewtêne... Zêdebîyayîşê radyoyanê transîstorînan ra pey Pîran de hûmara radyoyan vêşî bîyê. Şarî nê radyoyan şewanê hamnanan de vetenê serê banan û vengê înan hetan peynî akerdêne. Programê muzîkê Kurdkî yê radyoyanê Bexdat û Texranî heme şarê qeza rê dîyayêne goşdarîkerdiş... Ma domanan lehçeya kurmanckî ra zaf fehm nêkerdêne la beşê "waştişî" yê nê programan seba ma domanan zaf bizewq bî. Verê nameyê waştoxan dima nameyê kilame û yê hunermendî/e pîya wanîyayêne. Senî ke pêşkêşkerdox/e dest bi wendişê waştoxan kerdêne, ma seba ke nameyê hunermendo/a ke deyîre vajo/a texmîn bikê kewtêne bahîs. Meryemxan, Hesen Cizrawî, M. Arîf Cizrawî, Kawîs Axa, Mecîdê Herkî û nameyê sey înan vajîyayêne. Domano ke name raşt texmîn kerdêne zaf bextewer bîyêne..."*

Serrê dibistane seba her kesî/e manayêka cîyaye îfade kenê. Hela ke seba yew Kurdî/e Şima zî zanê ke hîkayeyê trajikomîkî yê Kurdan qet şenik nîyê. Hîkayeya Esparî ya tirkî û mektebo verên biney enteresan a:

*"Mi termînê 1961-62î de dest bi dibistane kerd. Domananê memuranê xerîban ra teber domanî tirkî nêzanayêne. No ziwan, mekteb de ameyêne musayîş/banderbîyayîş. La mi rê winî yeno ke ez tirkî baxçeyê mektebî de musaya. Ez heşt domananê keyeyî ra o 6. û tewr qijê/şenikê birayan bîya. Embazanê minê kaykerdişî û tewr qijê birayanê minê pîlan pîya dest bi dibistane kerdbîy. Nêzana ecizbîyayîş yan meraqî ver bî ez zî heme serre birayê xo reyde şiya dibistane. Gama ke wendakarî kewtêne derse ez zî bineyê darêka baxçeyî yê Dibistanê Ataturkî de ronîştêne û bi sebr tenefusî pawitêne. Tenefusan de xo rê înan reyde kay kerdêne; wexto ke zîle dayene piro ê agêrayêne sinife ez zî şîyêne binê dare. Tena na rewşe ver qeydê minê dibistane serrêk aver ameybî kerdêne. Mekteb de, baxçeyê ey de hetta teberê ey de bi Kurdkî qiseykerdiş bi hawayo qetî qedexe bî. Wendekarê ke semedo ke tirkî weş nêmusaybîy no qedexe îhlal kerdêne, eke no "suc" mamosteyî/e ra biameyêne vatiş cezaya ey antêne. Ez vana qey gama ke mi dest bi dibistane kerdbî, tirkî dereceya ke pê ceza nêwera de baxçeyê mektebî de bander bibîya, çunke qet nêno mi vîr ke mi naye ver ceza girewta."*

Sey hemê ferdanê jenerasyonê xo, o zî binê tesîrê atmosferê sîyasî yê serranê 1970an de maneno. Embazanê xo reyde şubeyê Pîranî yê DDKD awan keno. Goreyê fikrê ey kesê ke mabênê 1970-80an de hereketê Kurdan de ca girewto, xususîyetê înanê munhasirî estê; *"Zafaneyê nê kesan bi hawayo zanaye mucadele tercîh kerdbî. Înan seba îdealanê xo vîndîkerdişê zaf çîyanê muhîman girewtbî verê çimanê xo. Hîna muhîmêr zî înan seba rastbîyayîşê nê xeyalanê xo, xo sey subjeyê karî dîyayêne. Înan winî bawer kerdêne ke ê do bieşkê bi xeyal, hêvî û zerrîyanê xo dinyayêka newe ya ke her kes do ser o bewtewer bibo awan bikê. Înan meraq kerdêne., Huner, edebîyat, tarîx, şoriş, xulasa her çî meraq kerdêne. Înan îtîbarê xo bi kilîşeyan û reçeteyanê amadebîyayeyan ardêne sey şermêk dîyayêne. Seba înan keso ke nêno persayîş (sorgulanmayan) û rexnekerdiş çin bî. Tu çî tabu nêbî ..."*

Sey zafê welatperweranê ê deman o zî cuntaya faşiste ya 12 êlule 1980î ver mecbur maneno ke derbazê Kurdîstanê Rojawanî (Sûrîye) bibo. Demêk dima uca ra şono Swêd. Helbet hîs, hesret û psîkolojîya surgunîye ser o çend vateyê ey zî estê:


*"Netîceyanê tebîîyan yê surgunîya derge ra yew zî no yo ke ti çîyê ke xo ra dima verdayê, înan rê hesret manenî. Kabeya to welat o. Çimanê to ver hertim welat aseno. Hela ke sey Swêdî welato ke serd û tarî tede 6-7 aşmî domîyenê de bibî, çetinîya hesrete hîna zêde bena. Mêkanî, merdimî, hedîseyî, boyî, vengî, rengî, kitabî, dejî, bextewerîyî bi kilmîye her çî, çîyê ke to xo ra dima verdayê anê to vîr..."*

*Dîkenî peynîya roportajî de ey ra di persî pîya pers kerdê. O verên balkêş o, ma nê qismî bi ey û cewabê Esparî biqednê:*

*Îhsano delalî, perse min o peyên do hîna şexsî û taybet bibo! Na "J"ya ke ez vana qey eleqeyê aye bi serranê to yê surgunîye esta, yena çi mana?*

*"Derheqê na J de verê zî çend rey ame perskerdiş. Mi no name hetanî nika çi rey bi hawayo akerde nênuşt. 20 serrî yo ke ez ey vernîya nameyê xo de xebitnena û do naye ra dima zî bixebitna. Yew hîkayeya na herfe esta la nîyetê mi çin o ke aye nika eşkera bika. Ez hêvî kena ke ti mazur bivînî..."*

# Wendoxan derheqê ey de se va?



Mi çi wext bawerîya xo bi hîkayeyan arde, nêno mi vîr. Labelê mi ê hîkayeyan ra zaf hes kerd, mi waşt ke ez mîyanê înan de bimanî. Beyi Se Bena, hîkayeyêka nîyanêne bîye. Îhsan Esparî, destê mi tepîşt û ez girewta berda uca. Mi ra va "Biewne! Beyi na ya." A game mi zî a estore dîye. Espar, tena wayîrê yew estore nîyo, heqibeyê estora ey de hîkayeyî zî estê.

**Berîvan Zertenge**

Vengê winênî estê ke xo rê goşan virazenê. Ewro wexto ke merdim bi pêroyî biewnî ro edebîyatê kirmanckî ra o do bivîno ke Îhsan Espar vengêko winasî yo. Veng û vatişê mamosta Îhsan Esparî mîyanê xo de yew ra vêşêrî rewandan hewêneno û ma bi qelema ey wextanê vîyarteyan ra heta wextanê ameyeyan warêko hera û xorî de rastîya cuya xo tecrube kenê. Awazêkê mîrasê însanetî yê qedîmî reyde ma awiranê şorişgeranê modernan wanenê. Ma bi hubrê ey kewenê rêçanê tarîxê xo dima û seke tîjî yew prîzma ra bivîyaro, ma resenê rengan, vengan û heme ahenganê însanetî.

**Weysel Hanyildiz**


Derheqê Esparî de çîyo ke verê yeno vîrê mi seke merdim reqs biko bi o hewa çekuyan reyde kaykerdişê ey o. Ez vana qey no xususiyetê ey tena Edebîyatê Kurdî rê ney yê Dinya rê zî hakimbîyayîşê ey ra yeno. O wendoxanê xo vejeno raywanî. Raywanîyêka astral a ke Îlyada ra hetanî Muzeya Masumîyetî, Dante ra hetanî Kafka domîyena. Gama ke merdim hîkayeyanê ey waneno, xo hêgayêk de, sereyê xeleyan mîyan de hîs keno, boya çayîr û çîmenan gêno û vano qey meydanê dewêk de, serê henî de yo... Hende rastkên o her çî. Ez şaîrîya ey ser o zî naye vaja; çekuyê otantîk û yê modernî şîîranê ey de yenê têhet û ruhê ma ancenê xo mîyan.


**Remzîye Bayram**


Rew ra yo ke ez heyranê şîîranê J. Îhsan Esparî ya. Çîyo ke şîîranê ey keno bêemsal, zelalîya nuştişî ya. Her rêze bi ziwanêde basît la ancîya xorîn nusîyaya. Herçiqas ke ziwan rehet fehm beno, ancîya manaya çekuyan xorîn a, giran a. Bellî yo ke her çekuye bi baldarî ameya weçînitene. Her reya ke merdim biwano, boya hîkmetî ci ra yena, dilope bi dilope kewena zerrîya wendoxî. Bi mi, no hunero tewr girs o.

**Mahîr Dogan**

# Seyahnameya Ewliya Çelebî







FEXRÎYA ADSAY

**DEMA** qala dîroka Kurdan tê kirin yek ji babetên girîng kêmasî an neliberdestbûna çavkaniyên nivîskî ne. Sedemên vê kêmasiyê li aliyekî, çavkaniyên liberdest jî heqê wan baş nehatiye dayîn. Yek ji van, seyahnameya Ewliya Çelebî ye. Ewliya Çelebî yê di sala 1611 an de li Stenbolê hatiye dinyayê û di 1685 an de jî koça dawî kiriye, nêzî 50 salên temenê wî bi sehayatê derbas bûye. Di nav deverên wî dîtiye Kurdistan jî heye.

Ew yekem car di 1640 an de hatiye Kurdistanê. Di ser Erzirom, Makû û Tebrîzê re derbasî Qafkasan bûye. Cara duyem di 1649-50 an de rêya wî bi Kurdistanê ketiye dema ji Sûriyeyê çûye heta Sêwazê. Vê carê jî di Nizib, Birecik, Riha, Semsûr û Elbistanê re derbas bûye. Di vê navê de çûye Pertek, Sagman, Palû, Çêwlig, Dara Hinê, Lice û Pasûrê jî. Cara sêyem jî di 1655 an de tevî bixaltiyê xwe Melek Ahmed Paşa ku wek beylerbeyîyê Wanê hatiye tayinkirin rêya wî bi Kurdistanê ketiye û herî zêde vê carê maye. Di cilda 2, 3, 4 û 5mîn de behsa serpêhatî û çavdêriyên xwe yên li Kurdistanê dike ku bi tevahî li dor 400 rûpel digirin.

Ji seyahnameya wî diyar e ku Çelebî ne tenê mirovekî ji gerê re xurt bûye lê ew ji nivîsê re jî xurt bûye ku wek mirovekî têra xwe bimeraq çi dîtiye çi bihîstiye tomar kiriye. Çûye kîjan bajarî li wir çi mizgeft, mescid, xan, hemam, kaniyên avê, xwarin û vexwarin, çîrok û efsaneyên gelêrî, şert û mercên aborî, kar û bar, navê eşîran, medrese, teke, tax, sûk û bazar, cil û berg, huner, zeneet, ziman, devok, zarava, av û hewa, seyrangeh, bermayîyên dîrokî, navdarên bajêr... hebe hemû yek bi yek nivîsandine.

Ev seyahname digel ku bo dîroka Kurdistanê çavkaniyek bêhempa ye û li gor dema xwe ji aliyê naverokê ve ewqas dewlemend e, qasî ku tê zanîn xebateke tevahî li ser nehatiye kirin. Li Tirkiyeyê çend weşanxaneyên tirk ew bi tirkiya kevn û nû wek 10 cild çap kirine. Em nizanin ka ew beşên derbarê Kurdistanê de çiqas ji wan hatiye neqilkirin, jê hatiye derxistin an na. Heta niha sazî an weşanxaneyên Kurd eleqeyek taybet nîşanî vê berhemê nekirine û li ser nesekinîne jî ka ewa îro li ber destê me ye çiqas bêkêmasî ye. Ji çavkaniyên hin xebatên lêkolînî diyar e lêkolîner bo xebatên xwe ji tirkiya wê îstifade dikin lê di nav girseya xwînerên Kurd de seyahname pir kêm bal dikişîne an kêm tê naskirin. Mixabin, qasî tê zanîn, sazî an lêkolînerên Kurd xebateke taybet nekirine û hewl nedane ku bala xwînerên asayî bikşînin ser wê.

Dil dixwaze sazî an weşanxaneyeke Kurd ew beşên derbarê Kurdistanê de hemû ji destxetê bidana wergerandin bo Kurdî û çap bikirana. Ew jî nebû qe nebe tirkiya ew 400 rûpelan wek pirtûk çap bikirana û tevî nivîseke danasînê, nîşe û îzehetan çap bikirana. Werger nebe jî, bi heman awayî tirkiya wan 400 rûpelan wek pirtûkekê bihata çapkirin û bi hêsanî di nav xwînerên Kurd de belav bibûya. Bi taybetî ev girîng e ku Ewliya Çelebî beriya piraniya seyahên ewropî ku gelek ji wan berhemên wan (li bakur) ji aliyê weşanxaneyên Kurd hatine çapkirin. Û berfirehtirîn agahî wî dane.

Lê başûr û rojhilatê Kurdistanê lazim e ev beş hemû bên wergerandin bo Kurdî û bên belavkirin. Li gor zanyariyên Martin van Bruinessen ("Onyedinci Yüzvılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Ewliya Çelebinin Notları" Studica Kurdica, sal.2, hej.1-3, 1985) di 1979 an de li Başûr bo Kurdî (soranî) hatiye wergerandin lê ev gelek kêmasiyên wê hene ji ber ku nusxeya werger jê hatiye kirin bixwe gelek kêmasiyên wê hebûye. Piştî vê wergerek nû hatiye kirin an na, em nizanin. Ji bilî wergerê gelo li başûr û rojhilat xebateke taybet li ser hatiye kirin? Lêkolînerên vir çawa an çiqas dikarin jê îstifade bikin? Ger em tenê bo bakur bêjin, niha ji bilî deh cildên bi tirkî pirtûka Martin van Bruinessen Ewliya Çelebi Diyarbekir'de û ya Wilhelm Kölher Ewliya Çelebi Seyahatnamesinde Kürt Şehri Bitlis jî bi tirkî li ber dest in.



**Seyahnameya Ewliya Çelebî çima girîng e?**

Ev seyahname girîng e ji ber ku di sedsala 17mîn de hatiye nivîsandin. Ewliya Çelebî 350 sal berê ewqas zêde dever û bajarên Kurdistanê dîtiye, di sala 2017 an de di nav me Kurdan de pir kêm kesî ewqas cî dîtibe. Qasî tê zanîn, bo dîroka Kurdistanê ya vê sedsalê berhemeke jê dewlemendtir tuneye. Ligel bi çavê dîrokzanekî, bi çavê sosyolog, antropolog, etnologekî heta carna yê zimanzanekî jî dikare bê xwendin. Wek mînak, dema di sala 1655 an de yekem roja meha Remezanê Melek Ahmed Paşa êriş dibe ser Bidlîsê û Abdal Xan, wî têk dibe, Xan ji Bidlîsê direve lê salek derbas nabe Melek Ahmed Paşa hê beriya ku vegere Stenbolê Xan vedigere û kontrolê dike destê xwe, Ewliya Çelebî dibe şahidê hemû van bûyeran. Çelebî ewqas bi hûrgilî qala Bidlîsê, Abdal Xan, sohbetên xwe yên bi wî re, zanabûna wî, hebûna wî, dewlemendiya wî, têkiliyên wî bi dewleta osmanî re, bi derdora xwe re, heta xwarinên bo wan tên pêşkêşkirin, zimanê wan, avahiyên bajêr, cil û bergên wan dike ku ev seyahnameyê bo dîroka vê mîrnişîna Kurd dike çavkaniyeke bêhempa. Belkî di nav deverên li Kurdistanê zêdetirîn cî daye vî bajarî. Ev bixwe jî nîşaneya girîngiya Bidlîsê ye wê demê de. Li gor vegotinên wî, Bidlîs bajarekî têra xwe berbiçav, binavûdeng e û desthilatdarên wê wek ku serbixwe bin tevdigerin û ev dibe sedem ku Paşayê osmanî êriş dibe ser da ku hêza wî bişkê. Ger îro Bidlîs wek bajarekî biçûk û jibîrbûyî be, û gelek caran mirov ji bîr dike ku bajarekî Kurd e, tenê bo vê jî be divê mirov hay ji seyahnameya Çelebî hebe.

Ew bi hezaran pirtûkên Abdal Xan yên di her babetî û her awayî de ku Çelebî tenê bo wan 4 rûpel veqetandine û li ber çavê Melek Ahmed Paşa bi mezatê hatine firotin; pirtûkên barê heft deweyan ku ji sindoqên Xan bixwe mohr kiriye derketine, belkî ne Çelebî bûya me yê bi wan nizanibûya. Aqûbeta wan pirtûkan bixwe ji me re gelek dibêjin. Him nîşaneya dîroka me ya winda ne, bêberdewamiya an temenkurtbûna keda me ya bi her awayî ne ku nahêle danehevek siyasî û elbet çandî ya xurt, hafizayek me çêbibe. Lê tavilê berdewamiyekê jî tîne bîra mirov, di sedsala 20 û 21mîn de jî pirtûkên me hatin/tên îmhakirin an em ji ber tirsê wan îmha dikin. Wek mînak, di payiza 2016 an de di ew rojên ku hêzên dewletê bi ser mala ve digirt, hin kesan pirtûkên Kurdî yên li mala xwe avêtibûn ser sergo. Yên heyî ji em nizanin wê aqûbeta wan çi be. Gelo pirtûkxaneya Abdal Xan jî heta îro hatibûya, rewşa Bidlîsê û bi giştî ya Kurdan wê ne cudatir bûya? Ew ê bihata gotin ku Kurd tenê xwedî çanda devkî ne? Ew hemû pirtûk bi kuderê de çûn? û gelek pirsên din...

**Çavkaniyek bo dîroka zimanê Kurdî**

Kesên piçekî bi zimanê Kurdî re eleqedar bin pirtûka gramerê ya Garzoni, misyonerê îtalî nas dikin. Ev wek yekem pirtûka derbarê zimanê Kurdî de tê naskirin. Lê nêzî sedsal beriya wî Ewliya Çelebî, zêde ne bi berfirehî jî be, agahî an mînakên girîng dane bo zimanê Kurdî. Li gor Çelebî, Kurdî zimanekî serbixwe ye û zaravayên wê cuda hene, xwedî statuyeke bilind e, yek ji zimanên ewilîn e ku ser rûyê dinyayê peyda bûye. Heta belkî ji tirkî jî pêşdetir e. Ew berawirdkirineke wisa nake lê behsa tirkî jî nake dema zimanên sereke dijmêre. Û elbet hewce nake mirov bêje ku deverên Kurd lê dijîn jî wek Kurdistan bi nav kiriye Çelebî. Dema qala Meyafarqînê dike, bajarê Cudî wek yekem bajarê piştî tofanê ava bûye nîşan dide û sînorên Kurdistanê xêz dike: bi dirêjahî ji bakurê Erziromê, Wan, Hekarî, Cizîr, Îmadiye, Musil, Şehrizor, Herîr, Erdelan, Bexda, Derne, Dertenk an heta Besrayê; bi firehî ji rojhilat ve ji Herîr û Erdelanê heta Şam û Helebê.


Piştî sînorên Kurdistanê û li çendîn ciyên din behsa zimanê Kurdî dike mînakan dide. Yek ji van di cilda çaremîn de ye ku jimareyên Kurdî û çend hevokên kurt rêz dike: yek, dû, se, car, penç..., Selamet hanê? Halet çih? Cûş qelawî.... Çelebî ye ku yekem car ferhengokeke Kurdî amade kiriye û li Cizîrê jî stranek tomar kiriye ku dikare wek yekem mînaka folklora Kurdî ya nivîskî bê pejirandin (Bruinessen, n.n.b.)

**Paqijiya Diyarbekirê**

Di seyahnameyê de Diyarbekir ji bedenê bigre heta mizgevt, medrese, teke, kanî, sûk û bazaran, cil û bergên xelkê ji gelek aliyan ve hatiye qalkirin. Di nav van de navê 8-10 hemaman jî dijmêre û behsa sîstema avgermkirina wan dike ku bêtir bala mirov dikşîne. Çelebî dibêje ev hemû hemam her dem pir germ in lê ew ne bi agirê êzingan bi agirê gemara nav bajêr tê germkirin. Gemara nav bajêr bi selikan dibin hemaman û dişewitînin ji ber vê jî nav kuçe û kolanên bajêr piçek be jî gemar nayê dîtin. Nav bajêr û derveyî bajêr her dem paqij dimîne. Vê jî lê zêde dike ku ne tenê li vir li Erebistanê jî hemam bi vî awayî tên germkirin. Ev gemara nav Diyarbekirê îro û paqijiya wê demê çiqas zidê hev in!

**Pertek û Newroz**

Seyahname kêmtirîn du caran qala Newrozê dike. Carekê dema li Wanê ye qal dike ku li vir di rojên Newrozê de xelkê Wanê hesp, dewe an beranan didin lihevxistin. Ewqas, tiştekî din lê zêde nake. Cara din, dema li Pertekê ye. Li gor agahiyên wî, di zimanê moxolî de ji teyra qereqûş re pertek dibêjin. Beriya îslamiyetê li ser keleha vir peykerekî vê teyrê hebûye. Bi qewlê wî, her sal roja Newrozê de ev teyr baskên xwe li hev dixe û gazî hemû qewmên Kurd dike da ku werin li bazara nav bajêr li hev bicivin. Lewma navê bajêr wek Pertek maye. Dema ew jî bi Diyarbekirê re ji aliyê Xalid bin Welid tê zevtkirin, peyker hatiye rakirin lê hê jî li jorî kelehê ciyê wî peykerî diyar e. Mixabin, baş ne zelal e ka ev riwayet di serdema beriya îslamiyetê jê dihat bawerkirin an dema ew li wir bû jî dihat bawerkirin. Her kîjan rast be ne rast be jî hebûna vê riwayetê û nivîsandina wê ji aliyê mirovekî wê serdemê têra xwe balkêş û girîng e. Ger ev riwayet îro bihata gotin, bêguman we wek şîroveyeke neteweyî/bêhed an 'îcadkirina kevneşopekê' an bihata dîtin. Em nizanin gelo vê babetê bala ti lêkolîneran kişandiye û lê kolane an na. Sedsala 17mîn de/beriya îslametê lihevcivîna "hemû qewmên Kurd" çawa dikare bê şîrovekirin? Û çima li Pertekê?



## Sê çîrokên Stenbolê-II

# Erdheja Mezin (Bûmelerz)



CIWANMERD KULEK



Li jiyana rojane neye hestkirin jî, her kes hemfikir e ku dê li Stenbolê erdhejeke (bûmelerzeke) mezin bibe. Zanyar radigihînin ku erdheja 1999an çiqas tesîra xwe lê kiribe jî, di rastiya xwe de ne a Stenbolê bû, ango Stenbol ne navend bû. Erdheja hingê ji şikestina segmenteke berî segmenta Stenbolê a di xeta fayê a bakurê Enedolê de bû. Çend meh berê zanyarên Fransî tesbît kirin ku du xetên fayê di bin deryaya Marmarayê de di hev de asê bûne û bê liv mane; lê hema çawa ku bilivin dê bi şemitandineke du metreyî bibin sebeba erdhejeke bi mezinahiya 7-8 derenceyan. Herçiqas bi qandî pêşbîniyên li ser ciyên ku bombeyên terorê werin teqandin ne pirr be jî, carcaran şêniyên bajêr ji hev re gotar û peyamên ku tê de cihên ku eger erdhej çêbibe dê herî pir ziyanê bibînin jî (mînak, cihên li qiraxa deryayê) ji hevdu re dişînin. Di erdhejeke muhtemel de tişta herî pir xem û fikaran diafirîne avahiyên Stenbolê ne. Guman ew e ku di hinga bobelatê de dê rêjeyeke gelekî bilind (%70) ji wan hilweşin. Hesabekî Erebî jî dikare fikreke sawnak bide mirov ku ev teqabulî hejmareke çiqas mezin dike li yek ji bajarên xwedî nifûsa herî zêde li cîhanê. Lê li vî bajarê ku li gor daneyên dawî nifûsa wê gihaştiye 14 milyonan, mirov naxwaze hejmaran di hişê xwe de veguherîne risman.

Wek tevdîreke li hember vê metirsiyê, û yekane tişta ku diviya ihtîmala erdhejekê di bîr bianiya, projeyên Kentsel Dönüşümê (Vegehurîna Bajarî) li hin taxên bajêr li ser erdê ketin meriyetê, lê vê helmetê jî di demeke kin de gelek meseleyên ku mijara erdhejê di bin xwe de fetisandin û dan jibîrkirin bi xwe re anîn. Hinan got kultura taxan tê kuştin, em dixwazin ku wek berê îsot bi dîwarên hewşan ve bên daleqandin, li kûçeyan xalî bên şuştin, zarokên me bi hev re bilîzin û li hev xin û em jî ji rûyê wan de bi cîranên xwe re bi hev kevin,cîranên ku hînê dikarin li kûçeyê silavekê bidin hev û li halên hev bipirsin. Piştevanên vê komê diyar kir ku ne tenê mala xelkê, cîranên wan jî ji wan tên standin, lewma a baş ew e ku xaniyên xelkê ji wan re bên nûkirin û her kes di ciyê xwe de bimîne û li hember vê pîlansaziyê derketin. Li gor wan, jixwe gotin ne hewce bû, ew Veguherîn deriyê rantê bû ji bo alîgirên hikûmetê. Li aliye dî jî ên ku vê weke bezeka şahane a hespê kihêl ê aboriya welat, wate sektora înşeatê, didîtin ji van projeyan re lîlandin. Wan jî got Veguherîna Bajarî pêngava herî mezin û herî pêwîst a bajarê herî mezin ê welat bû; ev veguherîn ferz bû ji bo vî metropolê ku bi bê pîlanî û bê ser û ber hatibû lêkirin û mezin bûbû, û hetta ji nimêja sibehê jî ferztir bû. Ma ne xaniyên kevn û bê bergiriya hewayê (yalıtım) hem barekî zêde ê xerckirina gaz û enerjiyê li ser pişta aboriya welat dikir, hem xelkê nikaribû rihet di malên xwe de rûnên? Ma ne giştûk pîlan û tesîsatên kevn bûn, qeweta xelkê nedigihiştê ku wan nû bikin û ji rûyê wê di halekî ne ti hal de dijiyan? Ma ne gelek dever bûbûn kozik û xirbeyên fahşîtî û pîsîtî û şer û dizî û tiryakê? Ma ne gelek tax li ber rihma xwedê bûn û erdhejekê dikaribû ji agirên mezin û şewb û koleraýên zemanê berê bêtir kes bibirana ji nifûsa bajêr? Ma ne?

Di vê dubendiyê de, kesên ku ji guman û xeyalên wiha dûr, ji xwe re li ber tîna agirekî dî xwe germ dikin, xwediyên kox û xaniyên kevn in. Hin ji wan kêfxweş in ku xaniyê wan ên kevn î xerabe ên ku ji xwe re bi buhayekî kêm kirrîbûn dê veguheriyana daîreyên biqîmet ên di rezîdansên bilind de. Tevî ku ihtimal tine bû ew karibin di van balaxaneyên luks de bijîn û di ber aîdatên wan yên mehane re bigihên. Lêbelê buhayê qaremetra daîreyên ku dê bidin wan, xewna zengînî yan halxweşiyê dixe dilê wan û bêyî ku kêliyekê sawa erdhejê têkeve dilê wan bi vê erdheja diravî anoş dibin.

Di nivîsa berî vêya de min behsa du bobelatên li ser avê kiribûn: miçiqîna Boğazê û rabûna ava Boğazê. Divê ez mikur bêm ku di nav senaryoyên karesatên xeyalî û rastîn ên Stenbolê de, herî pirr ji vêya bejahiyê, ji erdhejê, ditirsim. Ne tenê ji ber ku li taxeke nêzîkî deryayê û di avahiyeke kevn û ne saxlem de dijîm. Ji ber ku kes bi wextê wê nizane û lewma ji hemû karesatên dî nêzîktir û rasteqîntir dixuyê. Ji ber ku tenê ev felaket ji dêvla hesta temambûnê û dawîlêhatinê hesta nîvcomanê bi min re çêdike. Ji ber ku min tenê, bi qasî serê derzîyê be jî, hest bi vê yekê kiriye heta niha. Min ev hest cara yekem duwanzdeh sal berê nas kir. Wê demê li Enqerayê xwendevan bûm. Mala me ya ku em çar kes tê de diman di qatê dawî ê avahiyekê de bû. Odeya min jî li qatê banî, ango terasa vê daîreyê bû. Piştî nîvê şevê, ez hînê li ber maseya xwe ya ji dara gwîzan rûniştibûm, min romana xwe ya yekemîn dinivîsî. Ji min pê ve kes wê rojê li daîreya me ya dubleks tine bû. Ji nişka ve li ser sendeliya xwe hejiyam. Wek dergûşê xweş bû, tirs û saw bi min re çênebû; lê aqlê min zûka ez îqaz kirim. Min rahişt kaxezên zer ên ku min bi hubra kesk ew dagirtibûn, lêbelê hema wê gavê di cî de sekinîm. Ez ê bi kaxezên romaneke Kurdî bireviyama kû? Min herî pirr xwest wê xelas bikim, û heçku herî pirr jî ji ber wê şerpeze dibûm. Dibû ku ez negihaştama jêr jî, dibû ku gava ez bigihaştama jêr ji min pê ve kes tine bûya jî. Min qederekê, di erênayê de, guhê xwe da ser dengên ji derve bên, lê pêjna kesî nehat. Ji şaşwazî û zexelî, min biryar da ku wê cidî negirim. Helbet, wê jî ez cidî negirtim. Piştre fêr bûm ku mezinahiya wê bi derenceya 5.3 bû. Piştî wê bi gelek salan, ew hest bi min re qayîm bûye ku ev bobelat kengî biqewime bila biqewime, miheqqe dê karekî min î girîng di nîvî de be. Lê gelo ez ê karibim wek wê carê wî karî temam bikim?

Hin heval, carina dema em behsa van tiştan ji hev re dikin, piştî gotinên xemok ên dûdirêj, meseleyê tînin ser wê ku kes nizane dema erdhej bibe mirov dê li kû be. Di erdheja dawî a Stenbolê de pirrên mirovan li mala xwe, di nav ciyên xwe de bûn. Ê min nizanim çima, ji min we ye ku ez ê ne li mala xwe bim, a ku qismekî mezin ê rojê lê derbas dikim, ne li kargeha xwe bim, a ku ji danekî zêdetir ê nava rojê lê derbas dikim, ne jî li riya mal û kar bim a ku bi saetan diajo. Ihtîmal e ez ê li ciyekî bim ku kêmtirîn wextê xwe lê derbas dikim: Ez ê di keştiyekê de bim kuji perrekî Boğazê diçe ê dî. Vê rêwîtiya herî kurt û herî rengîn a jiyana min carina weku îtiraza hişê min a li hember têgeha erdhejê ye ku hîn bêtir metirsiyê tîne ser bicihbûnê. Nizanim vê bêcihbûna ku bi çûnê û rêwîtiyê dikeve kiras û li ciyekî bê avahî xwe difesilîne, dê talûkeya li ser min çiqasî kêm yan zêde bike. Tenê bi vê dizanim ku Stenbola ku ji erd heta ezman bi avahiyan û bi mirovan tije bûye, cî tê de nemaye, dê bi qêrîneke tûj û hejokeke şid ji her carê xerabtir, di navê re, di kembera xwe ya şînik, kûçeya xwe ya herî nazik, Boğazê, re bibêje "qurp!" û bibe du parçe. A wê gavê her tişt dê nîvî bimîne. Akam û encamên tiştên ku min pirr dixwest bikim hîn pir li dûran, ez ê di vê kûçeya herî şên de li hilweşana bajêr binerim, weku bajar hemû bi ser min de birûxe. Lê di demeke wek hîç nebûbe û dom nekiribe de ez ê bi dîwarên hişk, bilind û dijwar ên Boğaza har bihesim. Dîwarên ku ti projeyeke Veguherîna Bajarî (Kentsel Dönüşüm) ji heqê wan dernakevin: pêlên dijwar ên li dû hev bi şid hildiweşin.

**"Stenbol ne Stenbola Berê ye" yan "Stenbol Nemaye"**

Alîyekî baş ê derd û meseleyên jiyana roj bi roj ew e ku gelek caran ew ji pirsgirêk û karesatên giran mezintir xuya dikin ji me re. Dema ez jî wek wan kesên ku bi xirecira pirsgirêkên rojane senaryoyên felaketên mezin ji bîra xwe dibin, didim nav derdê trafîkê, bihabûna kirêyan, deriyên nizmik ên daşirên mizgeftan, kêmaniya şînayiyê, qebehetên mirovên pê li serê hevdu dikin, wek şêniyekî Stenbolê, bi îlham yan ezbereke ji nişka ve, di ber xwe de yan ji kesekî li hember xwe re dibêjim: "êdî Stenbol nemaye."Hevalekî min ê Tirk, rojekê çaxa ev gotin ji devê min derket,awirek da min û tavilê peçeteyek ji ser maseya em lê rûniştibûn kişand ber xwe. Kezeba wî ji derdê bajêr û xelkê û hikûmetê reş bûbû. Rê ketibûyê ku hebikekî kerba xwe derxe.Qelemê min ji min xwest. Got, "Ez ê vêga meseleye giştî ji te re bibêjim," bi mirûzekî micid. Mirov li hember micidiyeke wiha ji xwe dikeve şermê û guman dike ku wek kesê li hember xwe tiştan cidî nagire. Xêzikeke rast li ser rûyê destmalkê xist, ew kir du qet, û ji min re got, "Biner!" Dû re destê wî li ser destmalka kaxezîn û devê wî di ber qalkirinê de wek bayê liviyan:

"**1951**
**Hannover:** nifûsa wê 500.000. **Stenbol:** 927.000.
**Hannover:** qada bi şînayî serê mirov 6,1 m2. **Stenbol:** serê mirov 27 m2."

Bêhnikekê serê xwe rakir, ew jî bi min re sekinî û weke tiştekî dî be li reşnivîsên ser destmalkê nerî. Dû re derbasî beşê dî bû:

"**2013**
**Hannover:** nifûs 550.000. **Stenbol:** 12.000.000."

"Arrrekê!!!" Serê xwe rakir û bi vê şaşmayîna min ket heyecanê. Nerma nerma dewam kir:

"**Hannover:** şînayî, serê mirov 14 m2
**Stenbol:** 2,4 m2."

Dû re qal kir ku ji wî 2,4 m2î jî çiqasê wê qadên eskerî û qadên dî ne ku mirov nikarin têkevin nav wan. Min axînek berda:

"Çû ji me de. Stenbol ne Stenbola berê ye." Lê dengê min, wek hawê dengê yekî dî be xerîb hat ji min re.

"Stenbol nemaye, birako," hevalê min got û qelem avêt ser destmalka bi herf û xêzikên tûrebûyî tije bûbû. "Ev rojên me ên herî baş in."

Kêliyekê dudil mam: Gelo bawer bikim ku rabirdû baştir bû û hesreta wê bikêşim, yan me pêşdeçûn nedîtin loma diviya min bêtir çavên xwe vekirana û qîmeta niha bigirta? Bi her hal, bêtir li welatên paşketî yan yekcar pêşdeneçûyî hesta nostaljiyê û qencdêrana rabirdûyê zêde ye. Lê gumanên min gelek in ji rastî û dadmendiya dîrokê li van deran. Dîrok carina başan xerab, xeraban baş, hejayan jî tine dike. Hevalê min ji nişka ve ragihand ku erdheja Stenbolê dê bibûya gava dawî ji bo qedandina vî bajarê ku pirrê wî ji xwe qediyabû. Lê destê wî ji min bêtir ji vir nedibû. Çunkî, ev bajar tevî û rexmî pirsgirêkên xwe xweş bû. Dû re ji xwe re fikirîm: Çi dibe bila bibe, mirovahî bi qandî ji felaketên siruştî dersan digire, ji ti karesatên siyasî yan civakî nagire.



Foto : © Ph. D



# Palpiştek bo muzîka Kurdî: Sîbera Deng





NÛJÎN ONEN

**STRANBÊJ** û muzîkjenê Kurd ji stranên xwe sîberek dîtine ku di wê sîberê de tu stran wenda nabin. Ji sala 2014an û vir de tîmek bi navê Sîbera Deng bi projeyekê derketin qada muzîka Kurdî. Mebesta vê tîmê ev e ku bi awayekî xwebexşî stranbêj an muzîkjenên ku bixwazin muzîk an stranên xwe arşîv bikin dildarên Sîbera Deng wan vedihewîna nav vê projeyê û bi awayekî profesyonel dengan tomar dike û di formata belgefîlman de klîban digrin û van klîbên tomarkirine di qenala xwe ya Sîbera Deng de diweşînin û arşîv dikin. Ev klîbên ku tên tomarkirin kesên ku bixwazin guhdar û temaşe bikin,-dikarin li ser qanala Youtube ya Sîbera Deng temaşe bikin. Dildarên muzîka Kurdî tîma Sîbera Deng ji 10 kesan pêk tê,ev tîm him ji aliyê dîtbarî him jî di warê deng de karekî profesyonel dikin . Dema mirov li stranan guhdar dike carna li ber peravek behrê,carna li serê çiyayekî mişt berf û carna jî li daristanekê xwe hîs dike.  Mustafa Köksalan derhênerê vê projeyê  ji Heftenameya Basê re behsa Sîbera Deng kir.

**Ji sala 2014an û vir ve heta ku ji me hat me xwest em bibin palpiştek ji vî karî re**

Dema mirov bala xwe dide kesên ji bo muzîk,wêje an zimanê Kurdî  dest bi xebatan dikin mebesta xebata wan ew e ku ew zextên ku li ser muzîk an beşê din yê zimanê Kurdî bi derfetên xwe bidin alî û rêyekê jê re vekin.  Derhênerê projeyê Sîbera Deng Mustafa Köksalan destpêkirina vê projeyê ji me re wiha tîne zimên;

Zext û pêkutiyên li ser zimanê Kurdî bi salan nehişt ku xebatên li ser deng û dîmenan bên kirin. Di destpêka salên 2000î bi pêşketina teknolojiyê, her çiqas du-sê xebatên arşîv û belgeyî hatibin kirin jî, têrî awaz û çandeke ewqas kevn û qedîm nekir. Ji sala 2014an û vir ve heta ku ji me hat me xwest em bibin palpiştek ji vî karî re. Bi vê mebestê,ew hunermendên ku me xwe gihand wan an jî ew ên ku xwe gihandin me, heta ji me hat me bi amûrên qeyd û deng-girtinê, ên herî baş û bi vegotineke sînematografîk xebat bi wan re kir.

**Her çiqas hê me li ser înternetê bar nekiribe jî di rastiya xwe de Sîbera Deng belgefîlmeke muzîkê ye**

Dema mirov derfetên teknolojiyê bi awayekî rast bikartîne dê projeyên wekî Sîbera Deng bêhtir zêde bibin Derhêner Köksalan li ser naveroka projeyê girtina klîban û tomarkirina dengan  agahiyên wiha dide me;

Her projeyeke me wek belgefîlmeke kurt a hunermendekî yan jî  ya komeke muzîkê berceste dibe. Her çiqas hê me li ser înternetê bar nekiribe jî di rastiya xwe de Sîbera Deng belgefîlmeke muzîkê ye. Di demeke nêz de em ê van qeydan gişî bi temaşevanên xwe re parve bikin. Ji bilî performansên stranan, em li gel her muzîkjenê/a ku tevlî vê projeyê dibe qeydekê dikin ku em ji vê qeydê re dibêjin solo performans. Performans giş bi awayekî zindî têne tomarkirin. Carinan bo tomarkirina hin stranan 9-10 caran em qeydan digrin.

**Mebesta me ew e ku em bi temamî li ser YouTubê bimeşin**

Ev xwe xwarên muzîka Kurdî ji projeya Sîbera Deng bi tu awayî ji aliyê aborî piştgiriyê wernagrin derhênerê projeyê derbarê vê rewşê de jî wiha dipeyive;

Bi awayekî fermî tu sponsorên me tunene. Niha li ser YouTube jî tu dahata me ya reklaman tuneye û qenala me bo reklaman girtiye. Lê belê ew şirketên telîfa staranên ku hunermendên me jî dibêjin wergirtine li ser qeydên me reklaman datînin û bi vî awayî hunermend ji vir dahatekê bi dest dixin. Ev jî bêyî ku me aciz bike em pê kêfxweş dibin.

Ji xeynî qenala Youtube ya Sîbera Deng jî stran û klîbên hatine amadekirin di qenaleke Kurdî de têne weşandin derbarê vê jî Köksalan wiha amaje dike; Hêza aborî ya bo berdewamiya Sîbera Deng niha tenê li Silêmanî, televizyona Kurdsatê ye ku navenda weşana wê Kurdistan e û birêz Çekdar Erkiran. Mebesta me jî ew e ku em bi temamî li ser YouTubê bimeşin û ji bo qenala xwe sponsorekê bibînin. Ku ev yek pêkan nebe jî em ê bi mecal û derfetên xwe ve vê projeyê berdewam bikin.

Mebesta vê projeyê ne tenê muzîkjen an stranbêjên navdar derxin pêş çi kesên ku dilê xwe û awaza xwe da ye muzîkê ger daxwaz bike ku stranên wan arşîv bibin dikarin di projeya Sîbera Deng de cîh bigrin derhênerê Sîbera Deng ji me re wiha behsa vê mijarê dike;

Ew kesên qenal û projeya me dişopînin dizanin, gelek kesên ku em bi wan re dixebitin ne kesên navdar in. Bes kêşeyeke me ya navdar û ne navdarîyê tuneye, em tenê li ser şopa muzîkê ne. Ew hunermendên navdar ku bikaribin li qadeke seyranê jî qeydê qebul bikin û ji hêla me ve nekevin nav hêviyeke mezin em dikarin bi wan re jî bixebitin.

**Sîbera Deng ne dibistanek muzîkê ye**

Dema min pirsî Sîbera Deng dê di pêşerojê de ji muzîka Kurdî re bibe çavkaniyek çawa? Derhênerê projeyê wiha bersiv da û got;

Sîbera Deng ne dibistanek muzîkê ye û ne jî di asta otorîteya wê de ye bes em dikarin bêjin niha hişmendiyek û bizavekê ava dike. Şêwazên xweser, hunermendên ciwan û ji xwe bawer û xwedî vîzyoneke dewlemend, çandeke li her cureyên muzîkê digunce li holê ye.

Dema hun li klîb û stranên ku ji aliyê Sîbera Deng ve hatine girtin guhdar û temaşe bikin teqez dê bala we bikşîne bi qey stranên kurmancî yên kirmanckî jî hene, derbarê zman û zarava û xebatan de wiha dipeyive;

Li navenda rêwîtiya me muzîka Kurdî heye û em hê li destpêka vê rêwîtiyê ne, niha tenê qeydên me yên kurmancî û kirmanckî (zazakî) hene arezû û daxwaza me ew e ku vê yekê berfirehtir bikin. Bes di vê rêwîtiyê de em dixwazin li gel hunermend û komên ku bixebitin bi teşeyê me û bi ziman û şêweyên ciyawaz bin.

Mustafa Köksalan behsa pirsgirêkên muzîkjen û stranbêjên Kurd rûbirû dimînin dike û berdewam dike; Muzîkjen di qadên ku em gelemperî wek bazarê bi nav dikin de bi çewsandin û bêedaletiyekê re rû bi rû dimînin. Ev hem wek aborî hem jî wek derûnî rewşeke domdar e. Taybetî bo ew kesên muzîka Kurdî dikin ne zehmet e ku mirov texmîn bike bê rewş çawa ye. Qadên xwe îfadekirinê hîn bisînorkirî ne û di van qadên bi sînor de xebat zehmettir dibin.

Derhênerê projeyê helwesta kom,stranbêjên tevlî projeyê bûne ji Heftenameya Basê re wiha şîrove dike Gelek muzîkjen ji ber ku ji vî karî hez dikin û evîndarê vî  karî ne dikin. Erê ji karê ku dikin gelek dilşad dibin bes dilşadî her bi xwe re aramiyê nayne. Ji ber ku di vê projeyê de muzîkjen palpiştiya me dikin dema me di serî de dest bi vê projeyê kir heman pirsgirêk derketin pêşberî me jî.

Beriya projeyê kesên ku daxwaz ji wan hatine kirin tevlî projeyê bibin û stranên xwe bistirên hin metirsiyên wan hebûne lê Köksalan dibêje roj bi roj ev yek ji holê rabû û wiha berdewam dike;

Di serî de ji nebaweriyê û ji ber hin sedemên polîtîk nexwestin beşdarî projeya me bibin. A rast em li benda kêşeyek bi vî rengî bûn. Me dizanî em ê bi domîna demê re mebesta xwe rast bigihînin û mebesta me ne ew e ku em li ser hunermendan di hêla aborî de tevbigerin. Ew bêbawerî û gumanên di destpêkê de hêdî hêdî ji holê rabûn û niha em ji hunermendan eleqeyek mezin dibînin.

Ji xeynî klîban belgefîlmên ku li ser Sîbera Deng klîbên di formata belgefîlman ji bilî Youtube li ser qanalek Kurdî tê nîşandan carna jî bêdestur hin qanal klîbên wan di qanalên xwe de diweşînin li ser vê him gazinê xwe dikî ji aliyaki jî dikene û derbarê vê yekê de Köksalan wiha amaje dike; Guhertoyên belgefîlmên me yên dirêj li tevizyona Kurdsatê têne weşandin ku ev televizyon li Başûrê Kurdistanê weşanê dike. Û belê bêyî ku destûra me hebe gelek qenalên muzîkê stranên me diweşînin, em jî carinan temaşe dikin.

Berê dema derfetên tomarkirina dengan bo arşîvkirinê tûnebûn kesên bi muzîkê mijûl kolan bi kolan gund bi gund li dengxweşan digeriyan û bi hêcetek wekî erebokên desta deng tomar dikirin. Dema min ji Köksalan pirsî hun jî gund bi gund li dengxweşan digerin wiha bersiv da ;

Em jî gelek qîmet didin vê rêbazê û yek ji wan riyan e ku em wek armanc dibînin. Bes bo niha projeya me bêhtir bi awayek sterîl didome. Ji gundan bêhtir em li bajaran qeydan digirin. Di demên pêş de em difikirin ku qeydên dengbêjan û vesazkirinên cuda arşîv bikin.

Derhênerê projeya Sîbera Deng Mustafa Köksalan li ser hejmara stran û perfomansên ku heta niha hatine arşîv kirin jî wiha diaxive ;

Heta niha bi giştî performansa 140 stranan hatiye arşîv kirin û nêzîkî 120 jî performansê solo jî me arşîv kirine.

Sîbera Deng ne dibistanek muzîkê ye û ne jî di asta otorîteya wê de ye bes em dikarin bêjin niha hişmendiyek û bizavekê ava dike. Şêwazên xweser, hunermendên ciwan û ji xwe bawer û xwedî vîzyoneke dewlemend, çandeke li her cureyên muzîkê digunce li holê ye.




Di serî de ji nebaweriyê û ji ber hin sedemên polîtîk stranbêja nexwestin beşdarî projeya me bibin. A rast em li benda kêşeyek bi vî rengî bûn. Me dizanî em ê bi domîna demê re mebesta xwe rast bigihînin û mebesta me ne ew e ku em li ser hunermendan di hêla aborî de tevbigerin. Ew bêbawerî û gumanên di destpêkê de hêdî  hêdî ji holê rabûn

